

NESİM SÖNMEZ

# DÎWANA ÎMAMÊ ŞAFÎ'Î

## Lêkolîn&Metin

Îmamê Şafî'î yek ji damezirînerê her çar mezhebên ehlê sunet we'l-cemaayê ye. Ew, digel ilmê fiqhê, di warê hadîs, tefsîr, kelim, hîkmet merîfet, feraset, ziman, edebîyat, helbest û hwd da jî kesekî pîspor e û derheqê van îlman da gelek berhem nivîsîne. Ji van berheman yek jî Dîwana wî ye ku piştî wefata wî hatiye berhevkirin. Mijara helbestên wî bi piranî di warê ilim, hikmet û exlaqê hesene da ne. Dîwan ji aliyê akademîsyen Nesîm Sönmez ve bi awayekî baldarî jî erebî bo kurdî hatiye wergerandin.

Mirov her dem dixwaze xwe bigihîne daxwazên xwe  
Lê xwegîhandina daxwazan tenê bi teqdîra Xwedê ye

Her çiqas mirov dibêje faydeya mal û milkê min heye  
Disan jî teqwatî baştirin e jî tiştên ku faydeyê didin te  
Îmamê Şafî'î

DÎWANA ÎMAMÊ ŞAFÎ'Î  
Lêkolîn&Metin

NESİM SÖNMEZ

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

ISBN 9786259756028



9 78625 9756028

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

**DÎWANA İMAMÊ ŞAFİ'Î**  
**Lêkolîn&Metin**

**Nesim SÖNMEZ**

*Şarkiyat*

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

Diyarbakır 2024

Hemû mafên weşandina vê pirtûkê aîdî Şarkiyat  
Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınlarıyê ye. Bê destûra  
weşanxaneyê û weşînerê wê nayê zêdekirin,  
kopîkirin û weşandin.

**Dîwana Îmamê Şafi'î Lêkolîn&Metin**

**Yazar:** Nesim Sönmez

**ISBN:** 978-625-97560-2-8

© Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları

E-Yayın/Aralık 2024, Diyarbakır

Tüm Hakkı Saklıdır

**Kapak ve Mizanpaj:** Fuat İstemi

**Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları**

Sertifika No: 52468

Mimar Sinan Cad. Aslan Apt. A Blok, Kat: 1,

No: 2, Yenişehir/DİYARBAKIR

<https://www.sarkiyat.org/>

[sarkiyatvakfi@gmail.com](mailto:sarkiyatvakfi@gmail.com)

**Nesim SÖNMEZ:** Di sala 1969an da li gundê Altûnana (Toptepe) navçeya Tekmana (Tatos) bajarê Erzurumê hatîye dinyayê. Di sala 1989an da li Erzurumê lîseya Îmam-Xetîbê qedandîye û di heman demê da li gor kevneşopîya medreseyên rojhilatê, di medreseya bavê xwe Seydayê Mela Seîd da xwendina medreseyê jî berdewam kirîye. Nivîskarî, ji sala 1991ê hetanî sala 2003yan li navenda bajarê Erzurumê û Îzmîrê melatî kirîye. Sönmez, di navbera 2003-2012an da li Rîze û Erzurumê di lîseyên îmam-xetîban da mamostetîya zimanê Erebî kirîye. Sönmez, di sala 2012an da li navenda Erzurumê bûyê mudurê damezrînerê Rabia Hatun Kız Anadolu Îmam-Xetîb Lîsesîyê û ev wezîfe hetanî 2014an berdewam kirîye. Di navbera salên 2009-2013an da li bajarê Erzurumê di Zanîngeha Atatürkê, Fakulteya Edebîyatê, Beşa Ziman û Çanda ‘Erebî da bi mijara “*Cahilîye Döneminde ve Sadru’l-İslam Döneminde Hitabet*” teza doktorayê amade kirîye û pileya doktoraya wergirtîye. Di sala 2014an da li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê di Enstîtuya Zimanên Zindî da wekî Dr. dest bi wezîfeyê kirîye. Nivîskarî, di sala 2019an da di Beşa Kurdî da pileya

doçentîyê girtîye. Nivîskarî, di vê navberê da di beşa Kurdî da serî li pileya profesoriyê daye û dê ev demajo di dawîya meha yekem a sala 2025an da biqede. Sönmez, vê gavê li heman zanîngehê di Beşa Ziman û Çanda Kurdî da kar û xebatên xwe berdewam dike. Nesim Sönmez; Tirkî û Erebi dizane, zewicandîye û bavê keçek û du kuran e.

Berhemên Nivîskarî:

- Îlmihala Şafi'î, Weşanên Sîtavê, 2014-Wan.
- Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî, Weşanên Seyda Kitabeviyê, 2018-Diyarbakir.
- Karşılaştırmalı Hitabet -Cahiliye Dönemi ile İslamın İlk Dönemi-, Weşanên Rağbetê, 2018-İstanbul.
- Fiqha Şafi'î, Weşanên Loryayê, 2019-Wan.
- Dîwana Mela Nûrullahê Godişkî, Weşanên Peywendê-2023 Wan.
- Alim, Edîb û Şairên Kurdînûs (Li ber çapê ye).
- Di TRT KURDÎ da bi dehan bername.
- Di gelek kovarên akademîk da bi dehan gotar.

Ez vê berhemê dîyarîyî  
bavê xwe dikim  
ku ew, ne tenê bavê min e  
yekem seyda û perwerdekarê  
min e...

## NAVEROK

PÊŞGOTIN .....	14
DÎWAN.....	33
BIHÊLE ROJ ÇI DIXWAZE BILA BIKE... 34	
GIRINGÎYA DIAYÊ.....	36
FIRQET.....	37
BELAYA HERÎ XIRAB .....	38
ZIRXÊ SEBRÊ .....	39
MAFÊ EDÎBAN.....	40
ŞANS.....	41
PORÊ SPÎ HIŞYARBÛNA FANÎTÎYÊ YE.. 42	
RÊZDARÊ KESAYETA XWE BE .....	45
QENAET .....	47
GILÎ Û GAZINDE .....	49
BAWERÎYA BI MUNECIMAN .....	50
XEM NAXWIM.....	51
FEZÎLET.....	52
DERKETINA XURBETÎYÊ.....	53
NÎYETA BI XÊR.....	54
DEV BERDE JI DAXWAZAN .....	55
EŞQ Û CEFA .....	56
BIFIKIRE Û BERSIVÊ BIDE .....	57
HESTÊN VEŞARTÎ.....	61

LÛTKEYA CAMÊRÎYÊ .....	62
BÊDENGÎ BERSIVDAYÎN E.....	63
RÊ Û RÊZANÊN XWENDINÊ .....	64
DOST .....	65
MÊRKOK Û ESILZADE .....	66
HÊVÎYA QENCÎYÊ .....	67
DADWERÊN DEMÊ .....	68
XWEŞBÎNÎ .....	69
MALBATA PÊXEMBER.....	70
MIROVÊ HERÎ BAŞ .....	71
HELBESTVANÊ QENC .....	72
XELEKÊN ZINCÎRÊ .....	74
BÊDENGÎ SELAMETÎ YE.....	75
MIFTÎYÊ MEKKEYÊ .....	76
ALIM Û SOFÎ.....	78
XEMGÎNÎ .....	79
BELAYÊN ZEMANÊ .....	80
XWEZILA KÛÇIK CÎNARÊ ME BANA ....	81
MIRIN RÊYA HERKESÎ YE .....	82
TINAZKAR Û HESÛD.....	83
KANÊ DOST .....	84
HESÛDÎ.....	85
ENDÎŞE .....	86



<b>HÊVÎDAR BE</b> .....	87
<b>RADESTÎYA XALIS</b> .....	88
<b>HELBEST</b> .....	89
<b>DAXWAZA MIROVAN</b> .....	90
<b>MAFÊ CÎRANAN</b> .....	91
<b>DAXWAZKIRINA ILMÊ</b> .....	93
<b>DEWLEMENDÎ</b> .....	95
<b>XWEDÊ YEK E</b> .....	96
<b>AMADEHÎYÊN AXRETÊ</b> .....	97
<b>NEFSA AZAD</b> .....	98
<b>BI TENÊTÎ</b> .....	99
<b>QÎMETA MIROVAN</b> .....	100
<b>HIŞYARÎ Û TEDBÎR</b> .....	102
<b>LÊBORÎN</b> .....	103
<b>ZEMAN DU ROJ E</b> .....	104
<b>RÊ Û RÊZANÊN MUNAZEREYÊ</b> .....	105
<b>FAYDEYA BÊDENGÎYÊ</b> .....	106
<b>RIZAYA BI QEDERÊ</b> .....	107
<b>DÎYETA GUNEHAN</b> .....	108
<b>EŞQA MISRÊ</b> .....	109
<b>BALDARBÛYÎN</b> .....	110
<b>PIRSGIRÊK</b> .....	111
<b>NEZANÎ</b> .....	112

<b>ÛLFET Û SEBIR.....</b>	113
<b>HEDÎS .....</b>	114
<b>HEVALÊN XWE ZÊDE BIKE.....</b>	115
<b>ZIRXÊ QENAETÊ.....</b>	116
<b>DOST .....</b>	117
<b>MINACAT .....</b>	118
<b>ŞÎRETVANÊ MIROVAN.....</b>	119
<b>RÛMETA NEFSÊ .....</b>	120
<b>ILIM FEXRA MIROVAN E.....</b>	121
<b>XULEFAYÊ RAŞIDÎN .....</b>	122
<b>ILIM NÛR E .....</b>	123
<b>COMÊRDÎ.....</b>	124
<b>HEZKIRINA JI EHLÊ BEYTÊ .....</b>	125
<b>CEFA .....</b>	126
<b>HEZKIRINA JI SALIHAN.....</b>	127
<b>ADABÊ NESÎHETÊ .....</b>	128
<b>NEDÎTINA KÊMASÎYÊN XELKÊ .....</b>	129
<b>ÇAVBIRÇÎTÎ KEPAZETÎ YE .....</b>	130
<b>BITIRSE JI NIFIRÊN MEZLÛMAN .....</b>	131
<b>AŞIQ JI MEŞÛQ RA SERÎ DITEWÎNE ....</b>	132
<b>TERIKANDINA ŞERAN .....</b>	133
<b>ÇAVNEBARÎ.....</b>	134
<b>QENAET Û ÇAVBIRÇÎTÎ.....</b>	135

NEŞERMKIRIN.....	136
DOSTÊ RASTEQÎN .....	137
EBÛ HENÎFE .....	138
XWEGÎHANDINA YARÊ .....	139
HÊZ NE HERTIŞT E .....	140
SIR.....	141
ŞİRÎNÎYA ILMÊ.....	143
NESÎB.....	144
EHMEQ.....	146
BIBE AGIR.....	147
HEZKIRINA JI WELAT .....	148
TEWEKUL .....	149
HER TIŞT BI AQIL NÎNE.....	150
ILIM JIBERKIRIN E.....	151
ZIRARDAYÎNA BÊHEMDÎ.....	152
NIVÎSÎN .....	153
HEQ.....	154
KARÊ XWE BI XWE BIKE .....	155
BEXTREŞÎ.....	156
ZAR Û ZIMAN.....	157
QENAET .....	158
FITNEYA HERÎ MEZIN .....	159
RÛNÊ MIBAREK.....	160

<b>FAQIH, SEROK Ê DEWLEMEND .....</b>	<b>161</b>
<b>NEFSA XWE BIPARÊZE .....</b>	<b>162</b>
<b>DEM MIN PERWERDE DIKE .....</b>	<b>163</b>
<b>FERQA ZANA Ê NEZAN.....</b>	<b>164</b>
<b>ILIM DEMEKA DIRÊJ DIXWAZE .....</b>	<b>165</b>
<b>QIRAL BELA NE .....</b>	<b>166</b>
<b>EHLÊ BEYTÊ Ê XULEFAYÊ RAŞIDÎN ..</b>	<b>167</b>
<b>HEZKIRINA JI EHLÊ BEYTÊ FERZ E ...</b>	<b>168</b>
<b>ÇAVNEBARÊN BID‘ETÊ .....</b>	<b>169</b>
<b>MUNAZERE.....</b>	<b>170</b>
<b>EHMED BÎN HENBEL .....</b>	<b>171</b>
<b>JEHRÎ Ê HINGIV .....</b>	<b>172</b>
<b>TEBÎB.....</b>	<b>173</b>
<b>EHLÊ ILMÊ PAYEBILIND E .....</b>	<b>174</b>
<b>SÊ NEXWEŞÎ .....</b>	<b>175</b>
<b>ILIM HEQÊ KÊ BE BIDE WÎ .....</b>	<b>176</b>
<b>GAZINDE .....</b>	<b>177</b>
<b>MIN TU CERIBANDÎ .....</b>	<b>179</b>
<b>MINACAT .....</b>	<b>181</b>
<b>FEZÎLETA ILMÊ .....</b>	<b>185</b>
<b>ŞEV Ê ROJ .....</b>	<b>186</b>
<b>XWEDÊ YA DILAN DIZANE.....</b>	<b>187</b>
<b>ŞERTÊ BIDESTXISTINA ILMÊ.....</b>	<b>188</b>

<b>CAMÊRÎYA NEFSÊ</b> .....	189
<b>HAY JI ZIMANÊ XWE HEBE</b> .....	190
<b>KÊMASÎYÊN ME</b> .....	191
<b>ÎBRETGIRTIN</b> .....	192
<b>QEDER</b> .....	193
<b>ŞÎRET</b> .....	194
<b>SÛZEN</b> .....	195
<b>KEŞTÎYA MU'MINAN</b> .....	196
<b>DADPERWER BE</b> .....	197
<b>ÇAVÊN BÊXEW</b> .....	198
<b>ÇAVBIRÇÎTÎ</b> .....	199
<b>AXAFTINA PÛÇ Û VALA</b> .....	200
<b>MIRINA HEZKIRÎYÊN ME</b> .....	201
<b>MINET</b> .....	202
<b>SERXWEŞÎ</b> .....	203
<b>EFTALÊ ILMAN</b> .....	204
<b>DÎNBÛNA DÎNBÛNÊ</b> .....	205
<b>DERBASKIRINA BI ÇAVNEBARAN RA</b>	206
<b>ILIM DIBE HÎDAYETÊ</b> .....	207
<b>ILIM KÛR E</b> .....	208
<b>JINA PÎR</b> .....	209
<b>MINACAT</b> .....	210
<b>ŞÊR Û KÛÇIK</b> .....	211

<b>BAJARÊ XEZZAYÊ.....</b>	<b>212</b>
<b>FAQIH Û SEFÎH.....</b>	<b>213</b>
<b>QENCÎTÎ.....</b>	<b>214</b>
<b>ELÎ NEVÎYÊN WÎ Û FATIMA.....</b>	<b>215</b>
<b>PIŞTA XWE BIDE NEZANAN.....</b>	<b>216</b>
<b>DOKTOR Û DERMAN.....</b>	<b>217</b>
<b>ÇAVÊ QAYÎLBÛNÊ NABÎNE.....</b>	<b>218</b>

## PÊŞGOTIN

Îmamê Şafi'î yek ji damezirînerê her çar mezhebên ehlê sunet we'l-cemaeyê ye. Wî, xwe bi xwe mezhebek danemezirandîye, lê gelek misilmanan bawerîya xwe bi fikr û ramanên wî anîne, berhemên wî ecibandine û li gor fetwayên wî, ji Xwedayê xwe ra îbadet kirine. Misilmanan derîyê dilê xwe ji wî ra vekirine û di dilê xwe da li ser kursîyeka taybet dane rûniştandinê. Bi vî awayî peyrevên wî zêde bûne û ew, wekî damezirînerê mezhebekî di navbera misilmanan da hatîye naskirin.

Navê wî yê eslî, Muhemed b. Îdrîs eş-Şafi'î ye, di sala 150/767an da li bajarê Xezzayê hatîyê ser rûyê dinê. Bajarê Xezzayê niha di nava erdnîgarîya Filistînê da cih digire. Wî, gelek zêde ji bajarê xwe hez kirîye û li ser bajarê ku lê ji dayik bûye helbestek nivîsîye. Şafi'î di helbestê da hestên xwe yên derbarê Xezzayê da weha anîye zimanî:

Xwedêyo! Min çiqas bîrîya axa Xezzayê kirîye  
Bi dilnexwestî dûrketime jê, ne hewceyî veşartinê ye

Xwedê bide avdan wê axê, xwezî min lêda destê xwe  
 Ji ber bîrîkirinê, axa wê wekî kilê dikişînim çavê xwe

Dema temenê Şafi‘î dibe du salî bavê wî emrê  
 Xwedê bi cih tîne û ew wekî êtîmek, di nav şert û  
 mercên zor û zehmet da mezin dibe. Di zarokatîyê da  
 dayika wî, wî dibe bajarê Mekkeyê, lewra ew li bajarê  
 Mekkeyê dest bi xwendinê dike. Tê rîwayetkirin ku  
 ew di heft salîya xwe da bûye hafîzê Qurana Pîroz û  
 di deh salîya xwe da jî berhema *el-Muwetta* ya Îmamê  
 Malik (711-795) ji ber kirîye. Şafi‘î bi armanca  
 hînbûna Erebiya fesîh diçe cem qebîleya Huzeylîyan,  
 nêzîkî bîst salan di nava Ereben bedewî da dijî û ji  
 wan hînî ziman û edebîyata Ereban dibe. Derheqê vê  
 mijarê da Şafi‘î weha dibêje: “Ez li cem qebîleya  
 Huzeylîyan jîyam; hînî zimanê wan, devoka wan û  
 kevneşopîyên wan bûm. Qebîleya Huzeylîyan, yek ji  
 herî zelal axivîtvanên qebîleyên Ereban e, ji ber vê  
 yekê ew bi ku ve diçûn ez jî li pey wan diçûm. Dema  
 vegerîyam bajarê Mekkeyê min dest bi nivîsîna  
 helbestan kir.”



Îmamê Şafi‘î li Hîcazê, Iraqê, Misrê, Şamê û li gelek deverên din xwendina medreseyê berdewam dike. Ew dema dibe seyda, li feqîyan şîretan dike û dibêje “Eger hûn dixwazin bibine alim, hewceye hûn ji welatê xwe derkevin biçin xerîbîyê û xwendina xwe li wan deran berdewam bikin”. Ka mêze bikin ew di helbesteka xwe da vê mijarê çawa dinirxîne:

Bibe rêwî, tu yê bibînî mikafata barê te dayê piştta xwe  
Xîretkêş be, lewra zewqa jîyanê di xîretkêşîyê da ye

Bêguman dizanim neherikandina avê, avê genî dike  
Lê ava herikandî paqij e, eger neherike ew ne paqij e

Tuneba, çûyîna xurbetîyê ma şêran dikirin nêçîra xwe  
Tîr derneketa ji kevanê ma xwe digîhande hedefa xwe

Eger hetav salewext bimaba bê hereket di rêgehê dê  
Bêzar nedibûn Ereba û Ecem, nediman di neçarîyê da!

Xwelîya zêr di cihê xwe da bimîne ew jî wekî axê ye  
Dara ûdê jî di cihê xwe da cureyek ji darên rêzê ye

Îmamê Şafi‘î, seydayê damezirînerê mezhebê henbelî Ehmed b. Hembel (780-855) e. Ehmed b. Hembel derheqê seydayê xwe da vê gotina xwe ya navdar dibêje: “Di destê kî da qelem û defter hebe di hustîyê wî da teqez keda Şafi‘î heye.”

Îmamê Şafi‘î, gelek qedr û qîmeta dost û hevalên xwe zanîbûye û xwestîye ku feqîyên wî jî qedr û qîmeteke baş bidine dost û hevalên xwe. Carekê şîretan li Yûnus b. Ebdul‘elayî (w. 264/878) dike û dibêje: “Yûnuso! Eger te derheqê hevalekî xwe da gotineka nebaş bihîst, demildest li wî nekeribe û hevaltîya xwe jî jê nebire. Di serî da gumana xwe piştrast bike, dev ji wan gotegotan berde û ji hevalê xwe pirs bike û bêje: Min derbarê te da gotinên weha weha bihîstin, ka tu çi dibêjî, gelo rast in an na? Eger ew, van gotinan înkâr bike û li wan xwedî dernekeve jê ra bêje: Temam birayê min, tu mirovekî rasteqîn û qenc î. Êdî gotinên hevalê xwe hilnegire û daneyîne. Eger ew xwedî li gotinên xwe derkeve û lêborîna xwe ji te bixwaze, tu vê lêborîna wî bigire û qebûl bike. Eger rastîya wan gotinan qebûl bike, lê sedemeka rasteqînî ji bo wan gotinan nebêje jê bipirse û bêje:

Armanca te ji van gotinên ku min bihîstine çî ye gelo? Eger ew, bersiva vê pirsê bi şiklekî di cih da bide, li wî guhdarî bike û wê gotinê jî qebûl bike. Eger ew bersiveka maqûl nede û ji te ra jî tu rêyekê nêhêle, tê zanîn ku kêmasîyeka wî hevalê te heye. Di vê rewşê da hewceye tu biryarekê bidî. Dê yan tu ji wî ra heman tiştan bibêjî yan jî wî bibexşînî. Lê hewceye tu bizanibî ku bexîşandin pileya teqwatîyê bilindtir dike. Bexîşandin nîşaneyê mirovê rûnêrm û qenc e. Lewra Xwedê Teala ferman dike ku “Cezayê neqencîyekê bi neqencîyek e, eynî mîna wê ye. Lêbelê kî ku bibore, aşîyê saz bike teqez xelata wî li ser Xwedê ye<sup>1</sup>...” Eger nefsa te, te fit dike ku tu bersiveka tund bidî hevalê xwe, wê demê rojên qenc yên ku te bi wî ra derbas kirine bîne bîra nefsa xwe û bifikire dostanîya xwe û hevalê xwe. Ji ber van sedeman qencîyên hevalê xwe yên ku wî berê ji te ra kirine, herweku nehatine kirin nehesibîne û bêhurmetîyê jê ra neke. Lewra tevgereka bi vî rengî zilm û zordarî ye. Eger tu xwedîyê dostekî heqîqî bî, wî bi dilnêrmî hembêz

---

<sup>1</sup> Sûreya Şûrayê 42/40.

bike. Lewra dîtina dostên heqîqî karekî gelek dijwar e, lê piştdayîn û çûyîn pir hêsan e.”

Îmamê Şafi‘î dibije bidestxistina heval û dostekî rasteqînî gelekî zehmet e. Wî derheqê nebidestxistina dostên heqîqî da zêde tengasî kêşandîye û ji ber vê yekê derbarê vê mijarê da helbestek nivîsîye. Ew ji bo vê meseleyê di helbesteka xwe da weha dibêje:

Di rojên tengasîyan da hevalê bêfayde  
Eger were qîyaskirin ew nêzîkî neyaran e

Radibe tê di wext û demên xemgînîyê de  
Eger dostekî rasteqîn û hevalekî heqîqî be

Her çiqas temen biborînim jî bi hêvîya dîtina dosteke  
Di rê û dirban da xweşbînîtiya min, min dixapîne

Bajar û niştecihên wan, guherandine xwûyên xwe  
Tu dibê welatîyên wan ne mirov in ne jî hemwelatî ne

Îmamê Şafi‘î kesekî comerd bûye. Derheqê comerdîya wî da er-Rebî‘ b. Silêman (w. 256/870) weha dibêje: “Feqîrek hat cem Îmamê Şafi‘î û got: Min berê ev karên hanê dikirin, Lêbelê niha ez feqîr ketime, ka gelo tu dikarî ji min ra bibî alîkar? Di heman demê da hema bêje qurişek pere jî li cem Îmamê Şafi‘î tunebû ku bide wî mîrovî. Îmamê Şafi‘î, ji min bi deyn dinarek girt û dayê. Piştî çûyîna wî feqîrî, mirovên li derûdora Şafi‘î jê pirsîn û gotin: Tu çima ewqas zêde destvekirî yî, te dikarîbû dîrhemekî yan jî du dîrhem bidaba. Îmamê Şafi‘î weha bersivê dide û dibêje: Ew kesê ku lêborîna xwe ji min dixwaze ez şerm dikim ku ji wî ra nebime alîkar.”

Îmamê Şafi‘î mirovên derûdora xwe teşwîqî comerdîyê kirîye û li ser giringîya comerdîyê sekinîye. Ew di helbesteka xwe da mijarê bi vî rengî dinirxîne û dibêje:

Hûn nebîne camêr wê gelek bûyer werine serê we  
Lewra dikare bibe destvekirî yan jî destgirtî, destê we

Eger hûn bibine destgirtî û ji camêrîyê dûr bisekinine  
Dê dinya bi diranê kursî we bicû wê çî hêvî bibe ji we

Dibe ku dewran jî şûnda bigire tiştên berê dabûye we  
Rastî xûyê dewranê ye tiştên ku daye şûnda dixwaze

Tê gotin ku Îmamê Şafi'î di heyata xwe da deh  
hezar malik helbest jiber kirîye. Ez bawer dikim  
şairtîya wî û pisporîya wî ya di warê çand û edebîyata  
Ereban da ji vê yekê tê.

Îmamê Şafi'î di 53 salîya xwe da li Qahîreyê di  
sala 204/820an da wefat kirîye û li heman cihî hatîye  
definkirin.

Şafi'î, di warê ziman û edebîyata Ereban da  
kesekî wekî otorîte hatîye qebûlkin. Wî, zimanê  
Erebî hem baş zanîbûye û hem jî bi awayekî herikbar  
karîbûye pê biaxive. Şafi'î, helbestên hinek  
helbestvanên Ereban jî ji ber kirîye û ew ragihandine  
nifşên paşeroja xwe. Di nivîsîna helbestan da qesta wî  
ne ew bûye ku bibe şair, berevajî bi armanca pend û  
şîretan li mirovan bike û rêya rast nîşanî wan bide  
nivîsîye.

Îmamê Şafi‘î hem alimekî fiqhê ye û hem jî şairekî bêhempa ye. Di vî warî da gelek pisporên ziman û edebîyata Erebi pesnê wî dane. Wekî mînak Ebdulmelîk b. Hişam (w. 213/827) dibêje “Şafi‘î di warê zimên da otorîte bû û zimanê wî dilkêş û bandorker bû”. Yûnis b. Ebdul‘ela (w. 264/877) jî derheqê zimanê Şafi‘î da van gotinan dibêje: “Gotinên Şafi‘î wekî şekir bûn, di axaftina wî da şîrînahî, xweşikahîyên rewanbêjîyê û xweşbêjîyeka békêmasî hebû”. El-Cahiz (w. 255/868) jî pesnê Şafi‘î dide û dibêje: “Min berhemên gelek alimên ku derketine lutkeya ilmê di ber çavan ra derbas kirin, lê ji Şafi‘î xweşiktir berhem nivîsandî kesekî nedît”. Yûsif b. Hebîb derbarê zimanê Şafi‘î da dibêje “Zimanê wî, ji kitêban mezintir e”. el-Muberrred (w. 286/899) jî dibêje “Şafi‘î, helbestvanekî herî baş û edebîyatnasekî herî qenc e.”

Mirov dikare helbestên Îmamê Şafi‘î wekî sehlê mumteni<sup>2</sup> bihesibîne. Wî di nesrê da zimanekî cuda û

---

<sup>2</sup> Sehlê Mumteni, hunera gotina aforîzmayên ku hêsan xwîya dikin, lê mirov dema hewl dide ku tişteki wiha bêje, dibîne

di nezmê da jî zimanekî cuda bi kar anîye. Şafi‘î, di nesra xwe da hem peyvên zelal û hem jî yên xerîb emilandîye, lê di helbestên xwe da lefzên xerîb û zorwate bi kar neanîne. Piraniya helbestên wî ji alîyê fêambarîyê ve zelal in û têgihîştina wan hêsan e.

Tevahîya helbestên Îmamê Şafi‘î muqette‘et in yanê malikên bijarte ne. Şafi‘î qesîdeyên dirêj nenivîye. Sedema şopandina vê rêyê jî ew e ku wî nexwestîye di tevahîya nivîsên xwe da têkeve pey şopa îcazê. Wî, mesajên xwe bê çiv û çûr yanê bi awayekî servekirî ji mixatabê xwe ra gotîye. Malikên wî bi rêzkirina peyvan û bi kêrahîya wateyên xwe bala xwîneran dikişînin. Wî, fikra “huner ji bo hunerê ye” nepejirandîye bîleks fikra “huner ji bo gel e” pejirandîye û ev rêç şopandîye.

Şafi‘î, di helbestên xwe da zêde pirrengî nexwestîye, helbestên ku têgihîştina wan hêsan e, nivîsîye û gelek caran jî ew jiberkî gotine. Ji ber vê yekê wî helbestên xwe bi tevahîya cureyên qafîyeyê nenivîsiye û dev ji qafîyeyên ku bi wan nivîsîna

---

ku ew gelek dijwar dixwîyê ye. Peyvên wiha xwedî wateyên kûr in. (N. Sönmez)



helbestan zor e, berdaye. Bo nimûne wî li gorî elîfbêya erebî bi qafîyeya [s, x, z, z, ş, t, z, ğ, w] ê helbest nenivîsîye.

Helbestên Îmamê Şafî'î ji alîyê mijarê ve her çiqas pirrengîyê nîşan bidin jî ew bi piranî şîret in û ji alîyê uslûbê ve jî wekî helbestên serdema cahilîyeyê têr û tijî ne. Di helbestên wî da bi awayekî zelal tesîra Qurana Pîroz û hedîsên Pêxemberî têne xwîyakirin. Ew bi helbestvanîya xwe gelekî bawer e, ji ber vê yekê di malîkekê da weha dibêje:

Eger helbestan qîmeta 'alîman kê m nekiriba  
Ez ê îro helbestvanekî ji Lebîd<sup>3</sup> baştir ba ma

Îmamê Şafî'î, di helbestên xwe da rê û rêbazên rewanbêjîyê (belaxetê) bi kar anîye û hunerên edebî jî bi awayekî hêsan û pisporane emilandîye. Haya wî ji

---

<sup>3</sup> Lebîd b. Rebia (560-661) yek ji helbestvanên Ereban yê serdema Cahilîyeyê ye. Ew dema misilmantîyê qebûl dike, dibe heyranê rewanbêjîya Quranê, pênûsa xwe dişikîne û dev bi nivîsîna helbestan berdide. (N. Sönmez)

her sê esasên mijara belaxetê yanê “beyan, me‘anî û bedî”ê gelekî xweşik heye.

Mezhebê Îmamê Şafi‘î; li Kurdistanê, Îranê, Misrê, Filistînê, Qafqasyayê, Azerbeycanê, Tirkîyeyê, Hîndistanê, Yemenê, Rojhilatê Afrîkayê, Endonezyayê, Malezyayê û li gelek deverên din belav bûye û îro bi milyonan peyrewê wî li ser rûyê erdê hene.

Ji ber ku Kurd ji sedî nodê wan şopînerên mezhebê Şafi‘î ne hema mirov dikare bêje Şafi‘îtî bûye mezhebê Kurdan yê neteweyî. Ez jî wekî her kurdekî şopînerê mezhebê Îmamê Şafi‘î me û min berê bi navê Îlmihala Şafi‘î berhemek nivîsî û paşê jî bi navê Fiqha Şafi‘î berhemeka din nivîsî û ew kirin xizmeta ehlê ilmê û gelê xwe. Di nivîsîna van berheman da ez têgihîştim ku Îmamê Şafi‘î ne tenê ehlê Quran û Hedîsê ye ew di heman demê da edebîyatnas û şair e jî û bi ser da ew xwedîyê dîwaneka muhîm e.

Min carekê ji bavê xwe û seydayê xwe yê yekem Seyda Mela Mihemed Seîd pirsra dîwana Îmamê Şafi‘î kir. Di bersivdayîna bavê xwe da ez hîn

bûm ku wî, dîwana Şafi'î xwendîye û ew gelek ecibandî ye. Min dîwan ji bavê xwe xwest, anî û dest bi xwendina wî kir. Dîwan ji alîyê Mihemed 'Efif ez-Zu'bîyî ve di sala 1391/1971î da hatibû berhevkirin û çapkirin. Min dema destên xwe diavêt kîjan helbesta wî û dixwend ez gelek ecêb û matmayî dimam û di hişê min da ev pirsê hanê derbas dibû: Gelo çima şairtîya Şafi'î hetanî vê gavê derneketîye meydanê û ew maye di bin perdeya alîyê wî yê feqîhtîyê da.

Di dîwana Şafi'î da helbesta yekem bi van malikan destpê dîke:

Bihêle roj çî dixwaze bila bike  
Razî be dema qeder biryarê dide

Ji bûyerên şevan hîç aciz nebe  
Lewra bûyerên dinyayê ne baqî ne

Min dema xwendina dîwanê qedand ez fikirîm  
ku gelo ez dikarim vê dîwanê wergerînim zimanê  
Kurdî û wê dîyarîyî edebîyata Kurdî bikim an na?  
Dilê min û hişê min bersiva vê pirsê bi erênî dan lê

cesareta min ewqas tunebû. Lewra ji alîyekî ve wergerandina dîwana Îmamê Şafî'î barekî gelek giran bû û jê ra demeka dûr û dirêj lazim bû, ji alîyê din ve jî kar û barê dinyayê gelo derfet didan min ku ez vê wergerê çêbikim yan na, min nizanîbû. Ji ber van sedeman min biryara xwe ya dawîyê nedabû.

Di meha mijdara sala 2019an da ez û çend hevalên xwe çûn Başûrê Kurdistanê û li Hewlêrê beşdarî konferansekê bûn. Di dema vegeza welêt da min fikra xwe ya derbarê projeya ji bo wergera Dîwana Îmamê Şafî'î, ji wan dost û hevalên xwe ra vekir. Wan, ev proje gelek zêde ecibandin û piştgirî dan min. Piştî ku vegerîyam welêt, min biryar da ku ez dê vê dîwanê wergerînim. Derheqê dîwanê da min dest bi vekolînan kir û di encamê da çend nusxeyên cuda yên dîwanê bi dest xistin. Piştî xwendina van nusxeyan, ji min ra qenaet çêbû ku ez dê di wergera xwe da xebata ku ji alîyê Mihemed 'Efîf ez-Zu'bîyî ve bi navê *Dîwanu'ş-Şafî'yê* hatîye amadekirin û di sala 1974an da li Beyrûtê di nav weşanên Mektebetu'l-Me'rîfetî-Daru'l-'Ulûmê da wekî 104 rûpel hatîye çapkirin bingeh bigirim. Piştî qedandina

wergera vê nusxeyê, îcar ez vegerîyam ser nusxeyên din û ew helbestên ku di nusxeya min a esasî da tunebûn ew jî wergerandin û xistin nav xebata xwe. Hinek helbest hebûn ku maneya wan wekî hev bûn lê bi peyvên cuda hatibûn nivîsîn, ji bo ku di wergerê da dubaretî çênebe min ew wernegerandin û nexistin nav xebatê.

Wekî ku tê zanîn di tradîsyona edebîyata klasîk da helbestvanan serenav nedane helbestên xwe û Îmamê Şafi‘î jî heman rê şopandîye û wî jî serenav nedane helbestên xwe. Lêkolînerên ku helbestên wî berhev kirine li gor xwe sernav dane helbestan. Min, dema dest bi wergera helbestan kir, hinek serenav ecibandin û girtin, hinek serenav jî li gor naveroka wan min li wan kir.

Îmamê Şafi‘î helbestên xwe li gor qafiyeyê nivîsîne. Piştî qedandina wergera helbestan min, ew li gor berhema Mihemed ‘Efîf ez-Zu‘bîyê rêz kirin. Lewra li gor elîfbêya latînî rêzkirina wan gelekî zehmet bû. Şafi‘î, helbest li gor kêşa erûzê nivîsîne, ew di bikaranîna erûzê da gelek serkeftî ye. Cureyê

helbestan qesîde ne û mijara wan eşqa Xwedê, resûlê wî û pend û şîret in.

Gotina herî dawîyê dixwazim bêjim ku sala 2020an wekî sala “Corona-2019”an hate binavkirin û gelekî bi zor û zehmetî jî derbas bû. Ji aliyê rêveberên dewletê ve gelek caran derketina kolanan û kûçeyan hate qedexekirin û xebat jî ne li cih û warên karan, di avahîyan da hatin berdewamkirin. Ji xeynî karê min ê rojane ev berhema hanê jî dikarim bêjim berhema rojên Coronayê ye.

Hêvîdar im ku hûn xwînerên ezîz vê berhemê bicibînin û wê bi kêfxweşî bixwînin. Daxwaza min ji we xwîneran ew e ku hewceye hûn vê berhemê ne tenê wekî dîwaneka helbestan bixwînin û jê kêf û zewqê werbigirin, digel girtina kêf û zewqa edebîyatê, wê di heyata xwe da jî bidine tetbîqkirin. Lewra Îmamê Şafî‘î ne tenê di serdema xwe da, di roja îroyîn da jî civakê li pey xwe kaş dike, dibe û wan binbandor dike. Mirov dikare bêje helbestên Îmamê Şafî‘î ji bo nexweşîyên kesayetî û civakîyê wekî reçeteyê ne û însan dikare vê reçeteyê ji bo dermankirina derd û kulan biemilîne.

Pisporên qada wergerê baş dizanin ku wergera helbestê bi taybetî jî helbesta biform, wezn û qafiyeyê gelek zor û zehmet e. Dema wergêr, dixwaze maneya helbestê wergerîne formê, wezn û qafiyeya wê xirab dibe, dema formê diparêze wê demê jî kêş û qafiyeyê xirab dibe. Me xwest ku ji aliyekî ve maneya helbestan bidin û ji aliyê din ve qafiyeyê biparêzin. Lê di hinek malikan da me rêziman Kurdî fedayî qafiyeyê nekir û li gor qaîdeyên rêzimanî çûn, lewra di hinek cihan da qafiyeyê hevudin nagire.

Ez ji dil spasdarê hevalê xwe Mamoste û Şair Sidîq Gorîcan (Hacı Yılmaz) im ku wî di nav kar û xebatên xwe yê giran da ji bo min dem veqetand û ji aliyê helbestvanîyê ve ev xebat di ber çavan ra derbas kir û fikr û ramanê xwe bi min ra parve kir. Dîsan ez spasdarê Muradxan Şemzînanî (Murat Erbaş) me ku ew ji aliyekî ve dostê min e û ji aliyê din ve jî xwendekarê min e ku wî digel nesaxîya bedena xwe ez ne şikêndim, ji bo min dem veqetand û ev xebat ji aliyê îmlayê ve kontrol kir û têbinîyên xwe bi min ra parve kir.

Di vê hewldanê da me gelek zêde serê xwe bi vê xebatê ra êşand û di encamê da ev berhem derket meydanê. Em îddîa nakin ku xebata me bê kêmasî ye, çawa di gelek xebatan da kêmasî hene teqez di vê xebatê da jî kêmasî hene. Xelîfe Yûsif (1885-1965) di dawîya berhema xwe ya bi navê *Îrşâdu'l-Îbâdê* da weha dibêje:

Ey xwendîya! Li min nekin lewm û 'îtab  
 Ger çi pur sehwa û pur 'eyb e ev kîtab  
 Hûn durust û teshîh bidîrin xoş cewab  
 Ji lutf û kerema xwu wellahu e'lem bi's-sewab

Eger di wergera helbestan da hinek kêmasî hebin jî, ku miheqeq hene jî, hûn xwînerên rêzdar me agahdar bikin û rexneyên xwe yên bi qîmet bi me ra parve bikin em ê dê ji we ra bibime deyindar û spasîyên xwe pêşkêşî we bikim. Ji bo ku berhema me zêdetir bikemile û xwe bigîhîne asteka bilind peywireka gelek giran dikeve ser milê we xwîneran.

Gotina herî dawîyê:



Ellah bes

Baqî hewes

Min ji xeyrî Xwuda

Nevêm tu kes. (Mela Zahirê Tendûrekî)

Kar û xebat ji me, teqdîr, hîdayet, bexîşandin û  
serkeftin jî ji Xwedê ye.

Digel silav û hurmetan.

**Nesim SÖNMEZ**

**Wan-2024**

**DÎWAN**

**BIHÊLE ROJ ÇI DIXWAZE BILA BIKE**

Bihêle roj çî dixwaze bila bike  
 Razî be dema qeder biryarê dide

Ji bûyerên şevan hîç aciz nebe  
 Lewra halên dinyayê nebaqî ne

Li hember tirsê wekî mirovên egîd be  
 Bila exlaqê te jî xweşbînî û dilsozî be

Di nav xelkê da eger zêde bin jî qisûrên te  
 Mizgînî li te be ku heye ji bo wan perde

Kêmasîyên ku dibînî bi xweşmêrî veşêrîne  
 Qisûrên xwe jî bi camêrîya xwe binixumîne

Tu carî hejarîya xwe nîşanî dijmin nede  
 Lewra henekê neyaran bela serê însan e

Qencîkarîyê ji çavtengan hîç hêvî neke  
 Lewra di agirî da, ji kesên tî ra av nîne

Bi xwegirankirinê riziq hîç kê mabe

Bi xwewestandinê jî qet zêde nabe

Ne xemgînî ne jî kêfxweşî her domdar e

Ne tengasî ne jî rihetî her li ser kar e

Eger dilê te xwedan qenaet be

Ferqa te û dildarên dinê nîne

Mirin were li mala kê mêvantîyê bike

Ne erd ne jî asîman nikare wê biparêze

Erdê Xwedê gelek berfireh û peng e

Lê di biryara qederê da dinya teng e

Bihêle bila felek bêbextîyê bike

Lewra derman ji mirinê ra nîne

**GIRINGÎYA DIAYÊ**

Tinazê xwe bi dia dikî û wî piçûk dibînî  
Ka dia dikare çî bike ma tu ji ku dizanî

Tîrên şevê hedefên xwe qet şaş nakin rast e  
Saet hat digêhêje cihê xwe, hîna dem maye

Eger Rebê min bixwaze wê digire bernade  
Oxir dike dişîne eger dema tetbîqa wê hatibe

**FIRQET**

Heywax ji xortê belengaz û ji dema wî ra  
Ew dijî di tuneyîya dost û hevalên xwe da

Eger temenê xort di kefika destê wî da ba  
Helbet wî ew diavêt di firqeta hevalan da

**BELAYA HERÎ XIRAB**

Derbarê jinan da pirole dîkin û dibêjine  
Teşqeleya herî dijwar hezkirina ji jinan e

Hezkirina ji jinan hîç teşqe nîne  
Belaya nêzîkbûna tiştê jê hezkerî ye

## ZIRXÊ SEBRÊ

Bila zirxê sebrê li xwe bike ew ê temen dixwaze  
Eger ew dûr bikeve ji dost heval û hezkerên xwe

Ew ê jîyaneka dûr û dirêj biborîne bi serê xwe  
Têne serê wî ji dijminê xwe ra belayan dixwaze



**MAFÊ EDÎBAN**

Ketime navenda civateka ewqas bê kêr û nezan  
Nizanin qîmeta ‘aliman, diguherînin serî bi lingan

Her çiqas mirov werin cem hev jî ew ne wekî hev in  
Ji alîyê aqil, edeb û esaletê ve cuda ne ji hev û din

Zêrê qelp bi rengê xwe heqîqî tê xwîyakirin  
Rast e, lê zêrê heqîqî bi qîmet e li cem serafan

Eger dara ûdê neba ji darên xweşbînîyê  
Qet nedima ferqa wê û darên ji bo şewatê

**ŞANS**

Şêr birçî dimirin li daristanan

Lê kûçik dixwin goştê mîyan

Bende radizên li ser hevrişiman

Lê xwelî ye doşega esilzadeyan

## PORÊ SPÎ HIŞYARBÛNA FANÎTÎYÊ YE

Agirê dilê min vemirî bi şewitandina porê min ra  
Şev li min bû tarî bi ronîkirina çirûskên agirê wî ra

Kîjan bûmê kor hêlîn çêkirîye di ser serê min ra  
Ligel dijî derketina min di dema firîna qijikan da

Şemirandim te bi dîtina wêranbûna temenê min ra  
Stargehên te ne, xerabeyên di welatan û dîyaran da

Gelo ez ê zewqê bigirim ji jîyanê, piştî spîbûna cênîga  
Ax! Nîşaneyên kaltîyê wenda nabin, bi hineya sor ra

Rast e hêza temenê mirovan heye di berîya kaltîyê da  
Ciwantî jî pişta xwe dide mirov bi pîrbûyîna nefse ra

Di temenê qonaxa rengzerî û porspîbûna mirov da  
Rojên kêfxweşîyê jî, wî dixine nava kerban û derda

Edî dest bikişîne, bes e tu mayî di nav karên nepak da  
Bêguman heram e kirina wan, ji mirovê ehlê teqwa ra

Teqez bizane zikata meqam jî heye ka te zikata wî da!  
Lewra wî jî xwe gîhandîye nîsabê di dayîna zikatê da

Eger qencîyê bikî ji serdestan ra dibin bende ji te ra  
Qezenckirina mirov heye di xêra ticareta camêran da

Bi pozbilindî nemeşe di rê û dirbên Xwedê da  
Dibe ku tu têkevî bin axa wê, di demeka nêzîk da

Kî tam bike dinyayê ku ez jî di nav tamkaran da  
Şîrînahîya wê û tehlîya wê hate pêşkeşkirin ji me ra

Min bi tenê neheqî û xwexapandinî dît di dinyayê da  
Çawa tenê serab tê xwîyakirin di navenda sehrayê da

Dinya wekî cendekekî mirarbûyî bê hereket dixwîya  
Kûçik gelek diewtîyan li ser xwarina berateyê wê da

Eger bikaribî dûr bisekinî jê, dimînî di selamîyê da  
Lê ber xwe ve bikişînî dimînî di hedefa kûçîkê wê da

Mirovê bextîyar e ew ê di quncikê mala xwe da  
Mirovê dilxweş e ew ê di mala perdekişandî da

## RÊZDARÊ KESAYETA XWE BE

Bêrûmetîyê bidim ber dijûnan şerefa min dibe zêde  
Lewra bersivdayîna bi gotinên nexweş, şerm e

Eger ez rêzdarîyê nekim ji kesayeta nefsa xwe ra  
Helbet ez ê firsendê bidime wê, ji kirina şeran ra

Eger tenê bifikirîyama ji bo berjewendîyên xwe  
Te yê bidîta min dev berdaye ji xwestekên xwe

Hal ev hal e ez im ê xwedî derdikeve li dostên xwe  
Şerm e ku hevalên mirovan birçî bin mirov jî têr be

Mirovê bêedeb û bêheya, bêperwa bi min ra diaxive  
Şerm dikim bikevim pileya wî û bidimê bersivekê

Ew bêşerefiya xwe zêde dike lê ez jî şerefa xwe  
Wekî dara bixûrê bêhnxeş dibe dema dişewite

Nebî nebî tu bidî bersivê, dema nezan diaxive  
Lewra bêdeng mayîn ji bersivdayînê baştir e

---

Eger tu biaxivî bi nezanan ra ew ê kêfxweş bibine  
Eger tu pişta xwe bidî wan ew ê ji kerban bimirine

**QENAET**

Min ehlê dinyayê ceriband bi wan ra tişteke tune  
 Tenê çermên bi timakaran tijî, digerîyan di wir de

Min şûrek kişand û derxist ji qalikê qenaetê  
 Hêvîya xwe ji wana qut kir bi alîyê wî yê tûj ve

Ne ew mirov e ku ez li rêya wî bipêm, min bibîne  
 Ne jî ew mirov e ku ez li derê wî rûnim, min bibîne

Dewlemendê bêmal ne hewcedarê mirovan e  
 Dewlemendî ne mal û milk e, qenaetkarî ye

Eger zilimkarekî, zilm kiribe pişekarîya xwe  
 Di kiryarên qirêj da bi israri zêdegavîyê neke

Xerckirina wî, hewaleyî şevên dûr û dirêj bike  
 Ew tiştên tene ji wî ra, di hesabê wî da tune ye

Bêguman me bi sedan zalimên îsyankar dîtine  
 Qure ne, zen dikin stêrk di siha hêştira wan da ye



Demeka dirêj derbas nebibû bi ser xefleta wan de  
Bûyeran, xwe dan nîşandan di pêşîya derê wan de

Ne mal ne jî meqamê wan ma, ew li xwe bigirine  
Nema hesenat ji bo wan di deftera emelên wan de

Lewra ew çî bikin li pêşberî wan ew derdikevine  
Loma Xwedê, wan bi qamçîyê ezabê ezab dike

## GILÎ Û GAZINDE

Yaqût el-Hemewî dibêje: Ji qebîleya  
Qureyşîyan xanimeka Îmamê Şafî'î hebû û wî ji  
xanima xwe ra bi henekî wiha digot:

Dema tu bibî aşiqê kesekî bela ye  
Eger meşûqa te hîç nebe aşiqê te

Rûyê xwe biguherîne dema dibîne te  
Tu pir bixwazî lê ew nepirse halê te

## BAWERÎYA BI MUNECIMAN

Bersiva min bişînin û bêjin ji wî munecimî re  
Tesîra gerestêrkan li ser qederê hîç çêbibe

Ya ez dizanim ew tiştê ku bûye yan jî ew ê bibe  
Nayê guhertin, ew di teqdîra Muheymîn<sup>4</sup> da ye

Ez şahidim ew ê remilavêjî yan jî stêrknasîyê dike  
Teqez ew derewker e û buxtanan li qederê dike

---

<sup>4</sup> Muheymîn, navek e ji navên Xwedê ye û tê wateya “Ew hukimdar û rêveberê her tiştî ye.”

**XEM NAXWIM**

Li cem te heye dil têrkin, lewra tu bes î ji bo min

Li gor min -eger rast be zena min- tu bes î ji bo min

Xem naxwim ji bo gelo tuyê kengê hez bikî ji min

Bi tenê bila dem rêyan nebire bi teşqeleyên xwe li min

**FEZÎLET**

Xortekî bêtecrube di dinyayê da xwedîyê fezîletê be  
Bêguman ew axaftina xwe li ser hustîyê mirovan dike

Lêbelê eger mirovekî wekî min nezan û bêfezîlet be  
Tê qîyaskirin bi zarokên dilîzin di kûçe û kolanan de

## DERKETINA XURBETÎYÊ

Ji xwedîyê aqil û edebê ra warê rihetîyê qet tune ye  
Nexwe derkeve xurbetîyê û dev berde ji welatê xwe

Bibe rêwî, tu yê bibînî mikafata barê te dayê piştî xwe  
Xîretkêş be lewra zewqa jîyanê di xîretkêşîyê da heye

Bêguman dizanim neherikandina avê, avê genî dike  
Lê ava herikandî paqij e, eger neherike ew ne paqij e

Tuneba, çûyîna xurbetîyê ma şêr dikir nêçîra xwe  
Tîr derneketa ji kevanê ma xwe digîhand hedefa xwe

Eger hetav salewext bimaba bê hereket di rêgehê da  
Bêzar dibûn Ereb û Ecem mirov diman di neçarîyê da

Xwelîya zêr di cihê xwe da bimîne ew jî wekî axê ye  
Dara ûdê jî di cihê xwe da cureyek ji darên rêzê ye

Ew ê diçe xurbetîyê ji bo wî jî daxwazên baş çêdibin  
Ew ê derdikeve xurbetîyê ew wekî zêrê zer ezîz dibe!

**NÎYETA BI XÊR**

Ez ê bigerim ji serî hetanî binî di welatê xwe de  
Yan ez ê bimirim yan jî bigêhêjim miradê xwe

Eger nefsa min bibe telef jî, xêra wî li ba Xwedê ye  
Eger derbikevim selametîyê, ez ê vegerim ji nêzîk ve

## **DEV BERDE JI DAXWAZAN**

Eger hişê te tevlihev bibe di hilibijartina du mijaran da  
Û tu biwestî di biryardayîna rastîyê yan jî çewtîyê da

Dev berde ji hewesên nefsê, guman tuneke ji nefsê ra  
Daxwaz, nefsan dixîne rêya ku dawîya wê şermkirin e



**EŞQ Û CEFA**

Eger dewamîya eşqa min dixwazî lêborînê bixwaze  
Û nebî nebî di dema hêrsbûnê da bixivî bi min ra

Min seh kir eger eşq û cefa rastî hev werine di dil da  
Teqez eşq namîne di dil da, derdikeve ji wir di cih da

**BIFIKIRE Û BERSIVÊ BIDE**

Eger derîyek were girtin yekî din vedibe  
 Karên zor hêsan dibin di hinek deman de

Bêguman piştî tengasîyan bêhnfirehî heye  
 Tu bizan, firêqetî di rêyên teng da veşartî ye

Gelek caran berdêlka kerbekî, du sivikahî ne  
 Bi aramî be ji xwe ra, feyda xeman hiç tuneye

Çima ewqas bêhêz î li hember tirs û xofên xwe  
 Ya rast ewqas tirsnakî ne hewceye ji bo te

Ji ewrên ku zîpikê dibarînin ewqas zêde metirse  
 Tu xelas bûyî ew jî çûn di wexteka zû da, binêre

Ê ku çûye cem riziq tu nînî, ew bi xwe hat cem te  
 Ma li pey gerîna riziq da, qet bêxew mane çavên te

Tu derbasbûyî di ser gelek mewc û pêlên har û dîn re  
 Derketî xurbetîyê dûr ketî ji dost û hevalên xwe

Dema mirov, parsekekî dibîne hema xwe vedişêre  
Lê perde tune di navbera Xwedê û parsekan de

Ew bi fezîleta xwe ve vedigere bal hêvîdarên xwe  
Li her der û her demê bersivdarê hêvîdarên xwe ye

Qet xemgîn nebe ji bo tiştên ku çûne ji destên te  
Tewekula xwe bide Xwedê riza wî bes e ji bo te

Di qedera te da çi nivîsandî be ew ê were pêşîya te  
Yan tu yê wî bi cih binî yan jî ew ê perîşan bike te

Kî dikare biguherîne agahîyên di kitêbê da hene  
Tiştên ku kitêbê red kirine kî dikare şûnda bişîne

Ger tu hinek caran neterikînî xemilandina xwe  
Dibe ku mirov hinek caran bi guman bimîne

Tu yê bikevî cihekî wisa ku ew bibe helaka te  
Lewra îsbatkirina wan e, tîrên ku bi ser te da têne

Dikarî dema xwe kifş bikî lê zêdegavîyê jî neke  
Bi rastî jîyana te ya wiha, nîşana ezîyetên te ne

Di vê demê da êdî şermendekirinê kêman bike  
Lewra mafdarên şermendekirinê kêman mane

Mirov kom bi kom derbas dibin û diçin rast e  
Lê tune di nav da rezîlên ku rêzdarê wan kûçik e

Qeşmer têne pêşîya te ji bo ku mizgînîyê bidine te  
Û delalên wan jî didin dijûnan di dewsa selamê de

Qencîyê bike, lewra mirovê azad kesê qencîkar e  
Azadî dûrketina ji qeşmeran e, xweparastina ji wan e

Direve xilas dibe eger Xwedê wî hewcedarî wan neke  
Yan jî di nava çewtî û rastîyan da şaşomaşo dimîne

Dev ji daxwazên xwe berde, lewra daxwaz bela ne  
Daxwaz, mirovan dixin rêya ku şermezarî têda heye

Berîya her axaftineka xwe hîlbijêrîne gotinên xwe  
Bêguman bizane ku ji her gotinekê ra bersivek heye

Xweştir dibe eger nukteyan têxînî nav gotinên xwe  
Dil û cîgerê mirovan dişewitînin hinek gotin hene

## HESTÊN VEŞARTÎ

Dema bûm bexşende xelas bûm ji kîndarîyê  
 Û nefsa min dilrihet bû ji xemên dijminatîyê

Dema xêrnexwazên xwe dibînim didim selamê  
 Xwe diparêzim ji şerê wan bi dayîna merhebayê

Çawa veşartî ne di dilê min da hestên hezkirinê  
 Wisa jî li cem neyaran kêfxweş tîm xwîyakirinê

Mirov nexweşî ne, nêzîkbûyîna wan te dike belayê  
 Lê ne rast e eleqebirîna ji wan û hiştina wan bi tenê

Eger hevalê dostê min be jî nakim bi wî bawerîyê  
 Ka bi çi hiş û aqilî bi xêrnexwazan bînim bawerîyê

Mirovê aqilmend dema rastî bedbextê xwe tî  
 Vedişêre di hundirê kincan da bedena kîndarîyê

**LÛTKEYA CAMÊRÎYÊ**

Ax nefsa min! Te cudahî kir, xwelî li serê te be  
Di dayîna mal da û di nav rûmetyarên feqîr de

Xemgînîya min ew e ku kesek were ji min bixwaze  
Û mixabin ew li cem min tune be, aha ev musîbet e!

**BÊDENGÎ BERSIVDAYÎN E**

Çi dijûnî dixwazî wî bêje ji namûsa min ra  
Bêdengmayînî bersivdayîn e ji serberdayîyan ra

Ez hîç bêçare nînim ji bo bersivdayîna ji te ra  
Lêbelê bersivdayîna şêran tune ye ji kûçikan ra



**RÊ Û RÊZANÊN XWENDINÊ**

Bi tebat be, li pêşberî talayî û cefayên mamoste  
Bêguman biserneketina ilmê ji revîna tengasîyan e

Eger mirovek tengasîyên hîndekarîyê tehm neke  
Ew salewext dimîne di nav tengasîyên nezanîyê da

Ê di ciwanîyê da firsenda tehsîla ilmê ji dest berdide  
Di mirina wî da bi tenê çar tekbîr têne gotin ji wî re

Bi Xwedê! Ciwanmayîn bi zanîn û teqwatîyê ye  
Eger nebin ev her du, ji bo ciwan tu îtîbarek namîne

**DOST**

Hez dikim ji dost û hevalên li gor dilê xwe  
Ewên ji kêmasîyên min digirin çavên xwe

Çi karê ku ez dixwazim ew pê qaîl dibine  
Di jîyan û mirina min da, min ji bîr nakine

Xwezîka min ew bidîtana, ka gelo ew kî ne!  
Helbet min ê parve bikira bi wan ra xêrên xwe

Derbas kir min di ber çavan ra dostên xwe  
Ligel piranîya wan kêm bûn ewên bi ewle

**MÊRKOK Û ESILZADE**

Dîrhem dide axaftinê mêrkokan  
Piştî bêdengmayîna esilzadeyan

Ne ji kesekî ra merhemetê dikin  
Ne jî ji camêrîyê ra cihekî datînin

Mal wisa dide axaftinê mêrkokan  
Wisa jî bêdeng dihêle esilzadeyan

## HÊVÎYA QENCÎYÊ

Eger bixwazî qencîyekê bibînî ji camêrekî  
Wî hêvî bike ji hosta û çêkerê mizgeftkî

Helbet şêr li mêvanê xwe derdikeve xwedî  
Û ji wî ra dike îkraman ji nêçîra saxî û mirî

**DADWERÊN DEMÊ**

Dadwerên demê derketine ji rê

Ew ketine zirarê bi aşkeretîyê

Axreta xwe firotine bi dinyayê

Nekirine kar, bi kirîn û firotinê

## XWEŞBÎNÎ

Mirovê ku nexêrxwazê min e lê min dike maîyeta xwe  
Ji bo Xwedê dibexşînim wî, spasdarê qencîyên wî me

Dê ez ê bibim alîkarê misilmanekî di roja mehşerê de  
Nizanim, an jî ji herî nebaşên umeta Mihemed bibime

**MALBATA PÊXEMBER**

Malbata Pêxember wesîleya xêran e  
Piştguh nakim, ji bo min ew wesîle ye

Hêvîdar im bidin min di siberojê de  
Deftera xêr û gunehan ji aliyê rastê ve

## MIROVÊ HERÎ BAŞ

Mirov bi mirovan ra ye, lewra berdewam e jîyan  
Car caran kêfxweşî tê, lê ew bayê nesîm e tu bizan

Di nav xelkê da mirovên herî qenc tu bizan  
Ew in, ên bi cih tînin hewcedarîyên mirovan

Êdî nekişîne destê xêrê ji alîkarîya mirovan  
Hetanî ji te tê zêdetir bike xêran û qencîyan

Şukurdarê Xwedê be lewra ew dide nîmetan  
Ew e xwedîyê te hewcedarî tune bi mirovan

Tevahîya miletekî bimire jî dimîne camêrîya wan  
Hinek mirov jîndar in, lê mirî ne li cem însanan



**HELBESTVANÊ QENC**

Mêvanê te dema vegere malbata xwe gelo ew ê çi bêje  
Rêwîfîya te cihê te çûyîn û hatina te çawa bû ew ê bêje

Derbas bûm ji Feratê, lê venexwar ava wê, ew ê bêje  
Lewra pêlên Feratê yên dîn û har êrişî min dikirine

Her çiqas di rêya lûtkeyê da hilkişîyam bi pêlekanê ve  
Wenda bûm di şoprêyê da tengav bûm di kendalan de

Çawa di pîyaleya avê da xwîya dike toza di avê da ye  
Têbigêhêje ewê gotinên tê yên nerm û xizanîya te bêje

Tu bizan yaqûtên helbestê û mircanên wê bi min ra ne  
Ew ê hildikişe ser çelenga gotinê ku taca wê ez îm

Gul û sosinên min hêşîn dibin di baxçeyên bilind de  
Gotinên min ên hevrîşim dihejin bi dilopên xwîsîk re

Mimkun e ku şairekî baş ji çermê marekî reş derkeve  
Tu bizan! Şî‘r, hem kirêsa şair e hem jî kakilê wî ye

Dijminatîya helbestvanan nexweşîyeka bêderman e  
Dermanê vê nexweşîyê bi tenê di dilê camêran da ye

**XELEKÊN ZINCÎRÊ**

Di hinek belayan da ciwan tên xeniqandinê  
Lêbelê çareserîya wan heye li cem Xwedê

Bi şidandinê zeximtir dibin xelekên zincîrê  
Bela hin caran di bêhêvîyê da têne helkirinê

## **BÊDENGÎ SELAMETÎ YE**

Gotin: Tu bédeng mayî, lê dujminatîya te tê kirin  
Min got: Mifteya derîyê xirabîyê ye bersivdayîn

Bêdengmayînî şeref e li hember nezan û ehmeqan  
Him jî bi bédengîyê namûs û heysîyet tê parastin

Ma tu nabînî şêr, çiqas bi xof in digel ew bédeng in  
Kûçik her dem têne kevirkirin digel ewitandina wan

**MIFTÎYÊ MEKKEYÊ**

Er-Rebî' b. Silêmanî dibêje: “Dema ez li cem Îmamê Şafi'î bûm, mirovekî di destê wî da perçeyekî kaxizê hebû hat ba me. Şafi'î dema li kaxizê mêze kir rûyê wî beşîşî, wekî bersiv li ser kaxizê hinek tişt nivîsî û da wî mirovî. Me ji hev ra got: Wî, ji Şafi'î ra pirsek kir lê piştî bersivê ne li kaxizê ne jî li bersivê mêze kir. Em bi pey wî mirovî ketin, me xwe gîhandê û da sekinandin, jê kaxiz girt û xwend. Li ser kaxizê ev malik hebû:

Biçe ji miftîyê Mekkeyê bipirse gelo guneh e  
Di serîlêdana evîndarê û di nêzîkbûyîna wê da

Di binê pirsê da jî bersiveka bi vî rengî hebû:

Ez dibêjim: Neûzû bîllah bila teqwatî neçe  
Xwe zeliqandina bi cihê hundir ra heram e

Ez gelekî ecêb mam di fetwaya Şafi'î ya bi vî  
rengî da, çûm cem wî û min jê pirsî: “Ey Ebû

Ebdullah!... Tu weha fetwayê didî xort!” Şafi‘î bersiva min da û got: “Ey Ebû Mihemed!... Ev mirov jî nesla Haşimîyan e, ew di vê mehê da zewicîye (yanê di meha Remezanê da) û temenê wî jî piçûk e. Ji min pirsî û got: Bêrazandina pê ra, ez dikarim jina xwe maçî bikim an jî wê li hembêz bikim? Min jî weha fetwa da.”

Min piştî vê bûyerê derheqê rewşa wî xortî da hinek lêkolîn kir. Çawa ku Şafi‘î gotibû ew nû zewicîbû. Bi rastî min kesekî wekî Şafi‘î bi feraset hîç nedîtîye.

**ALIM Û SOFÎ**

Him bibe alim him jî sofî, lê nebe ji yekî tenê  
Pend û şîretan dikim li te, ji bona riza Xwedê

Dilê yekî hişk be qet teqwatî tam nekirîye wê  
Ewê din jî nezan e, ew ê çawa were islahkirinê

## XEMGÎNÎ

Madem a biryarê dide qeder e, xemgînî ne hewceye  
Di lewhê mehfûz da çî nivîsandî be ew ê were serê te

Li benda xweşîyê be û li hêvîya sedeman jî bimîne  
Hêvîya xwe jî ji rewşa derûnîya ku tu têda yî bibire



**BELAYÊN ZEMANÊ**

Belayên zemanê zêde ne, tu car nayê dawî li wan  
Şahîyên wê jî kêma in ji te ra dixwîyên wekî cejnan

Bindest û hustûxwar dîkin ew, giregirên mirovan  
Tu dibînî ku ew bûne bende li ber destê ‘evdalan

## **XWEZILA KÛÇIK CÎNARÊ ME BANA**

Ji xêra Xwedê ra kûçik cînarê me bana  
Xwezika tiştên ku me dîtî wan nedîbana

Kûçik şûnda vedigerin nava stargehan  
Lê xilas nabe şerê navbera mirovan

Bireve û rihê xwe rihet bike di tenêtîyê da  
Eger bi tenê bî tu dimînî di kêfxweşîyê da

**MIRIN RÊYA HERKESÎ YE**

Hinek dixwazin mirina min, em bêjin ez mirim  
Dibe ku ev çareyek be lê ez li wir bi tenê nînim

Ne mirîyên pêşîya min dikarin zîrarê bidin min  
Ne jî saxîya kesên li paş min in, min dikin bêmirin

Ew ê ku dibêje tu dîmirî û dixwaze tunebûna min  
Dibe ku ew bibe tune, berîya hatina ruhstîne min

## TINAZKAR Ê HESÛD

Ez hatim cem mirovan, min xwest bipirsim ji wan  
Ka heye dilsozekê ewledar ji bo dijwarîya deman

Di demên dijwar ê rihetîyê da ketim nav keft ê leftan  
Min bang kir gelo heye alîkarek ji min ra, ji jîndaran

Tenê dît, tinazkarê bi rewşa min a xerab dike tinazan  
Ê yê di kêfxweşîya min da ji min dike hesûdîyan

**KANÊ DOST**

Bêhed û hesab bûne dost û heval bi mirovan re  
 Min zen dikir ku derûdora min bi dostan tijî ye

Lê di tengasîyê da min dît xîyaneta dostên xwe  
 Ew bêwefa ne wekî demê, qet yek ji wan namîne

Tunebim ez, bi nebaşî didine dijûnan ji min re  
 Di nexweşîyan da kesekî nayê seredanê nakine

Başî û kêfxweşîya min sedema xemgînîya wan e  
 Nexweşî û xemgînîya min jî egera dilgeşîya wan e

**HESÛDÎ**

Hêvî heyê dijminatî bi tevahî vegere bi bal dostîyê ve  
Ewên hesûdîya te dîkin û dibîne neyarên te ne tê de

**ENDÎŞE**

Gelek rûken hene, mirin li derûdora wan diçe û tê  
Eger heba haya wan ji xeybê, ew ê bimirana ji tirsê

Kesên ku nizanin dê bi saxî xwe digîhîne sibehê  
Bêje gelo ew ji bo çi digerin li pey rizqê sibehê

## HÊVÎDAR BE

Ajnê dikî di nav gunehan da wekî kerîyek cemedê  
Eger te ditirsîne gefxwarinên roja şûnda vegeê<sup>5</sup>

Bizanibe ‘efwa Muheymîn li gazî û hawara te tê  
Nîmetên wî zêdetir li derûdora te têne herikandinê

Nebî nebî qut bikî hêvîya xwe ji lutf û kerema Xwedê  
Welew kerîyek goşt jî bî di malzarokê yan jî pitikê da

Eger bixwestaba û dogeh bikiriba ebedî Rebê Alemê  
Ma qet diniquatand dilê te dilopên îlhama tewhîdê

---

<sup>5</sup> Roja şûnda vegeê: Roja qîyametê. (N. Sönmez)



**RADESTÎYA XALIS**

Eger xwarina min a rojekê tenê jî hebe li cem min  
 Ey Seîd! Dilnerihetî hîç nikare bisekine li cem min

Nayê hişê min fikarkirin ji bo rizqê siberoja min  
 Helbet hatîye teqdîrkirin rizqek ji bo pêşeroja min

Radestî Xwedê dibim eger bike daxwazekê ji min  
 Eger Xwedê qaîl nebe bêqîmet in daxwazên min

**HELBEST**

Eger helbestan qîmeta ‘aliman kêm nekiriba  
Ez ê îro helbestvanekî ji Lebîd baştir ba ma

Di şeran û pevçûnan da ji şêran wêrektir ba ma  
Ji malbata Muhelleb û Yezîd jî wêrektir ba ma

Eger tirsî min ji Rebbê min ê Rehman tuneba  
Li pêşberî min dibûn bende tevahîya mirova

**DAXWAZA MIROVAN**

Mirov her dem dixwaze xwe bigêhîne daxwazên xwe  
Lê xwegêhandina daxwazan tenê bi teqdîra Xwedê ye

Her çiqas mirov dibêje faydeya mal û milkê min heye  
Dîsan jî teqwatî baştirîn e ji tiştên ku faydeyê didin te

## MAFÊ CÎRANAN

Rojekê mirovekî tê cem Îmamê Şafî'î û dibêje: "Hevalê te yê filankes nexweş e." Îmamê Şafî'î dibêje: "Te bi vê agahîdayînê xêrek qezenc kir; lewra te ez dam hişyarkirin û xistim rêya qencîkîrinê, te ez xilas kirim ji gotina bihaneyên nerast ku min ê ji hevalê xwe ra bigotiba." Û gazî dike: "Xorto! Çarixên min bîne..." Û gotina xwe weha berdewam dike: "Bi pêxasî, birîndarî û bi zikê birçî rêvaçûyîna li ser xwelîya li ber tavê sor bûye xêrtirîn e ji hevalekî ra gotina mazereteka tewşomewşo û derewîn." Paşê jî vê helbesta jêrê dinivîse û dixwîne:

Di bicihanîna heqîqetê da ez zêde dibînim rihetîyê  
Eger terk bikî bi zanayî ew ê bi ser te da bikeve rojekê

Wekî şanseki bes e, venasîna te ya bi derewkarîyê  
Lewra gotina "ez nizanîm"ê qet nîne ji hêsangotîne

Ewê piştî heqê kurapê xwe li heqê cîrana bike rîayetê  
Û li hevalên xwe yê çî nêzîk çî jî dûr bike rêzdarîyê

Serdest dijî û bi bîranîna wî, mirov dikeve dilsozîyê  
Herwiha dema mirina wî jî bi dilxwazî diçin oxira wê

## **DAXWAZKIRINA ILMÊ**

Ew ê dixwaze ilm û zanînê ji bo roja axretê  
Dibe ji serkeftîyan û dikeve rêya heqîqetê

Û bi dest dixîne spehîtiya wê daxwazîyê  
Hem jî dibe yek ji hevalê dostên Xwedê

## FAYDEYÊN RÊWÎTÎYÊ

Ji bo armancên mezin ji welat dûr bikeve  
Bibe rêwî, di rêwîtiyê da hene pênc fayde

Xilas dibî ji xeman û derdê debarê jî namîne  
Ilim, toreyên civatê û suhbeta bi qencan re

Eger were gotin ku zîlet û bela di rêwîtiyê da hene  
Ew bihurîna ji sehryan û berxwedana tengasîyan e

Mirina ciwantîyê xêrtir e ji sekinandina di zîletê de  
Û ji jîyana di navbera gotingeran û çavnebaran de

**DEWLEMENDÎ**

Bi destê wî digirim ji bo bûyîna dewlemendîyê  
Nizanim gelo gihêştîye min xwîyê wî yê camêrîyê

Bi rastî qezenca min wekî dewlemendan ne zêde ye  
Belav dikim tevahîya qezencê ji ber xwîyê camêrîyê



**XWEDÊ YEK E**

Çawa îsyan tê kirin li Xwedê, ez ecêb mame  
Bi zanahî çawa diguherînin ji wî, berên xwe

Hal ew e ku di her hereket û sekinandinê de  
Şahidên hetan û hetan ji bona Xwedê hene

Bêguman di her tiştî da ji bo wî wesîqe hene  
Ew wesîqe jî îşaret dikin ku teqez ew wahid e

## AMADEHÎYÊN AXRETÊ

Ey! Ew kes ê dinya hembêz kirîye û bernade  
Û bi şev û rojan di dinya xwe da rêwîtîyê dike

Haydê dev ji dinyaya ku te hembêz kirîye berde  
Ku bikaribî hembêz bikî horîyan di firdewsê de

Eger dixwazî bijî heta hetayê di buhiştê de  
Hewceye xwe nebînî ji agirî, wekî emînekî

**NEFSA AZAD**

Çîyayê Serendîbê<sup>6</sup> bibarîne încîyan  
 Bîrên Tekrûrê<sup>7</sup> jî bipijiqînin zêran

Ne bijîm, dimînîm bê xwarin û vexarin  
 Ne jî bimirim, dimînîm bê kêlik û gor

Camêrîya min wekî camêrîya qiralan  
 Ziletê kufir dizane, azad e nefsa min

Eger qenaeta min hebe ji bo rizqê min  
 Çima biçime serdana Zeyd û ‘Emran

---

<sup>6</sup> Serendîb navê welatê Sirî Lankayê ye. (N. Sönmez)

<sup>7</sup> Tekrur navê qebileyeka çermreşan e û ev qebile li welatê Senegal û Ganayê dijîn. (N. Sönmez)

## BI TENÊTÎ

Eger nebînîm destekî teqwa, tenêtiya min şirîntir e  
Lezettir û tamxweştir e, ji jîyana bi kesê di delaletê de

Helbet di dilxweşiyê da bi tenê îbadetkirin xêrtirîn e  
Ji sohbeta di heman qonaxê da bi mirovekî xeternak re

## QÎMETA MIROVAN

Îmamê Şafi‘î dema xwe digîhîne Bajarê Samîrayê<sup>8</sup> cil û bergên lê pînekirî û qilêr, porê wî jî dirêj bûye. Ew diçe cem sertiraşekî, sertiraş ji ber ku wî nas nake, wî wekî kesekî qilorek dibîne û jê ra weha dibêje: “Here cem sertiraşekî din.” Bi vê gotinê Îmamê Şafi‘î gelekî aciz dibe û vedigere ser xortê ku di xizmeta wî da ye jê dipirse: “Çiqas pere li cem te heye?” Xort dibêje: “Deh dînar.” Îmamê Şafi‘î dibêje: “Wan bide sertiraşî”. Pîştî ku xort pereyan dide sertiraşî, Îmamê Şafi‘î van malikan dibêje:

Li min hene hinek kinc eger ew werine firotin

Bi rastî, qurişek jî zêde ye ji bo qîmeta wan

Lê têda heye nefsek, eger were qîyaskirin bi wan

Ew ji wan zêde ezamettir û mezintir e bêguman

---

<sup>8</sup> Samîra navê bajarekî Iraqê ye û ew dikeve aliyê rastê Çemê Dîcleyê. (N. Sönmez)

Eger qalikê şûran kevin be jî ma zîrarê dide şûran  
Li çi werine xistin dê wê perçe bikin eger tûj bin

Bêguman roj piçûk dibînin şekl û şemala min  
Di qalikên peritî da çi şûr hene ma hûn dizanin!

## HIŞYARÎ Û TEDBÎR

Dema margîsk<sup>9</sup> xwe şaş bike û xetere zêde bibe  
Bêje ji bo wî, tişta herî baş girtina tedbîrê ye

Te li rojên baş meze kir û zen kir her roj wisa ye  
Qet netirsîyayî ji nebaşîyên encama qedera xwe

Mixabin tu hatî xapandin bi arambexşîyên şevên xwe  
Hema dikevî xweşaramîyê, zêde dibin derd û kulên te

---

<sup>9</sup> Margîsk, navê malbateka maran e. (N. Sönmez)

## LÊBORÎN

Kesek bixwaze lêborîna xwe wî bibexşîne  
Welew ku gotina wî rast be yan jî derew be

Eger zahirê wî kêfa te bîne ew îtaetkarê te ye  
Û îsyankarîya di batinê wî da te qîmettir dike



**ZEMAN DU ROJ E**

Dem û dewran du roj in, ewledarî û xeternakî  
Jîyan jî du jîyan in, jîyana dilrihetî û ya xemgînî

Cendek li ser behrê bi ro da diçin, ma tu nabînî  
Halbûkî di kûrahîya behrê da hene bi sedan încî

Her çiqas bê hed û bê hesab stêrk hene li asîman  
Bi tenê berê rojê û hîvê tê girtin teqez tu bizan

## RÊ Û RÊZANÊN MUNAZEREYÊ

Eger tu xwedîyê agahîyan bî û eger hebe fezîleta te  
Bizanibî nakokîyên di navbera pêşîyan û paşîyan de

Bi dengê hêdî û bi rûnêrmi munazereyê bike  
Wê ne zêde bi israrîyê ne jî bi pozbilindîyê neke

Di sûdwegirtina bêminetîyê da fayde heye ji te re  
Di nukteyên xweşletîfî û hikmetên nadirî da jî heye

Ha! Xwe biparêze ji pevçûna ku têda rikeberî heye  
Ku xwe nîşan bidî û bi quretî bêjî, min ew têk birîye

Bêguman li ber van qiraxan şer û pevçûn zêde digere  
Bi edeb xwedan tevdir be û bixwaze hevrişî wî bibe

**FAYDEYA BÊDENGÎYÊ**

Bêdengî, min wekî ticaret dît û çûm li pey wê  
Eger peran qezenc nekim jî qet nakevime xesaretê

Ticaretê mirovên mezin e, sekinandina bêdengîyê  
Balatirînê hemû ticaran e, ticarê ticaretê bêdengîyê

**RIZAYA BI QEDERÊ**

Qet kêfxweş nînim ji bûyerên demê  
Lê her dem razî me bi hukmê qederê

Welew roj bi ehda min ra jî bike xîyanetê  
Û eger bi qehirandinê jî be razî me ji rewşê

**DÎYETA GUNEHAN**

Ji min ra hate gotin: Filankes xeyba te dike  
Û qebûlkirina ziletê ji bo kesê ciwan şerm e

Min got: Hat cem min û xwest lêborîna xwe  
Li ba me dîyeta gunehan xwestina lêborînê ye

**EŞQA MISRÊ**

Min gelek zêde kirîye bêrîya Misrê  
Cihên din li gor min dişibihin sehayê

Bi Xwedê nizanim serkeftûbûn û zengînî  
Min dibin Misrê yan jî dişînin gorê

**BALDARBÛYÎN**

Di derbasbûyîna demê da wekî demê be  
 Di teqwatîyê da jî wekî rahibê dêran be

Ji demê û ji ehlê wê bişoyî destên xwe  
 Bila haya te ji hezkirina xêrên wan hebe

Min ji dil xwest lê nedît dostek ji xwe re  
 Bibim hevalê wî hetanî dawîya temenê xwe

Şemirand bindestên wan, şerê wan zêdetir e  
 Şemirand serdestên wan, xêra wan kêmtir e

**PIRSGIRÊK**

Dema pîrsgirêk derkeve pêşîya min  
 Radixînim rastîyê li ber çavan

Zimanekî mîna kefa devê Erhebînan<sup>10</sup>  
 Yan jî mêrekî mîna şûrê Yemenîyan

Nînim ez kesekî bê fikir û bê raman  
 Bipirsim xeberan ji filan û bêvanan

Belê ez im berdevkê dil û zimanê wan  
 Ez im gazîkarê xêran û defîkarê şeran

---

<sup>10</sup> Erheb, navê qebîleyeka Ereban e. (N. Sönmez)



**NEZANÎ**

Tu him nezan î him jî ji zanayan napirsî  
Wê demê tu yê çawa bizanibî û fêm bikî

Eger te bizanîba yan jî zen bikiraba tu nezanî  
Nediketî rikê ew ê dizane ilmê ku ez nizanîm

## ÛLFET Û SEBIR

Difikirim ji dilsozî û arambûyînê çiqas dûr ketime  
Spasdarê xîreta xwe bim jî rexnegirê temenê xwe me

Di daxwazîkirinê da tu kêmasîyeka min tune ye  
Lêbelê fermana Rebbê mirovan di serê min da ye

**HEDÎS**

Îkram bike, ji bo cemaeta ciwanan  
Wekî nebatên sedrê ne, bêhna wan

Ew her car bi qedeha îşqê tijî dîkin  
Navbera dil û gurçikên mirovan

Şeraba wan her dem vexwarina hedîsan  
Qedeha wan bê dawî digere li ser destan

Dubendî û xirabî têkeve navbera wan  
Talûke tê derê wan, ev e azmûna wan

**HEVALÊN XWE ZÊDE BIKE**

Heta ji destê te tê zêde bike ji xwe ra hevalan  
Lewra di xwestina piştevanîyê da alîkar ew in

Ji bo mirovê xwedanhiş hezar heval jî kêr in  
Dijminek jî gelek zêde ye ji bo te bêguman

**ZIRXÊ QENAETÊ**

Ji bo ku min biparêze, li xwe dikim zirxê qenaetê  
Namûsa xwe pê vedişêrim û diparêzim bi wê xesletê

Ne mimkûn e xwewandina ji xayîntîya wextê  
Hedef im, bi ser min da tê bi tîra mirin û feqîrîyê

Bi Xwedê û ‘efwa wî amade me li hember mirinê  
Xwe dispêrim sebrê li hember feqîrî û xizanîyê

**DOST**

Di rojên tengasîyê da hevalê bêfayde  
Eger were qîyaskirin ew nêzîkî neyaran e

Derdikeve tê di wext û demên xemgînîyê de  
Eger dostekî rasteqîn û hevalekî heqîqî be

Temen biborînim jî bi hêvîya dîtina dostekî  
Di rê û dirban da xweşbîntîya min, min dixapîne

Bajar û niştecihên wan, guherandine xwîyên xwe  
Tu dibê welatîyên wan ne mirov ne jî hemwelatî ne

**MINACAT**

Xwedayê min! Dilê min dibe destyar di rehma te da  
Di veşartî û eşkeratî, di serê sibehê û dawîya şevê da

Nehatime vegerandin ne di xewê ne jî di hênijînê da  
Tenê vedigerim bi zikirkirina di nava nefes û nefsê da

Teqez te naskirina xwe îhsanî min kir di dilê min da  
Tu guman tuneye di mezintî û nîmetdayîna te da

Bêşik hatim bi wan gunehên ku hene di zanîna te da  
Hemd ji te ra şermezar nebûm bi dayîna musîbetan ra

Eger rewş wisan be, îhsan bike zikrê salihan ji min ra  
Bila tevlihevî di warê dînî da çênebe di serê min da

Herdem bi min ra be ew di dinya min û axreta min da  
Wekî sûreya Ebeseyê te şandîye di heşirkirina min da

## ŞÎRETVANÊ MIROVAN

Ey şîretvanê mirovan! Ew karê tu dikî çi ye  
Ey ew kesê temenê wî nefes bi nefes diçe

Por û rûyê xwe yê spî ji qirêjîyê biparêze  
Lewra ne mimkun e spîtî qirêjîyê veşêrîne

Nebe ji wî mirovê ku kincan ji bo şuştinê dibe  
Lê ji qirêjî û gemarîyê kincên wî lewitandî ne

Tu dixwazî serkeftinê lê nameşî di rêya wî da  
Ne mimkun e keştî li ser berrîyê biherike û biçê

Bêguman, siwarbûna li darbestê ji bîra te dibe  
Siwarbûna te ya li ser zînê qantir û hespê

Roja qîyametê ne mal ne jî zarok fayde dide  
Hembêza qebrê, şeva zîfafê jî ji bîrê dibe



**RÛMETA NEFSÊ**

Kişandina didan, lêdana hespê  
 Şûnda vegerîna doh, mirina bedenê

Seqema zêde, kuştina sûcdar bi qisasê  
 Di tunebûna tavê da debaxkirina çermê

Xwarina dêlemarê, nêçîra hirçê  
 Di erdê şorax da çandina toximê

Pufkirina agir, barkêşandina şermê  
 Firotna xanî bi çaryekê panotekê

Firotna şimikê, dûrketina ji dîlberê  
 Bi werisê saxlem lêdana li dîlberê

Çêtirîn tevger e ji bo serdestê  
 Xwestina alîkarîyê ji qeşmerekê

**ILIM FEXRA MIROVAN E**

Îftixar bike bi ilmê lewra ew zevîya şanazîyê ye  
 Baldar be bila fexra wê zevîyê neçe ji destê te

Bizane bêguman para wan di ilmê da qet tune ye  
 Ên derdê wan xwarin-vexwarin û kinc lixwekirin e

Bi tenê ew kesê ku dostê ilmê ye û ji ilmê hez dike  
 Dev bernade ji ilmê çi tazî çi jî kinc li xwe kiribe

Ji bo nefsa xwe tameka zêde ji ilmê wergire  
 Êdî ji bo ilmê dev ji xewê û karên qirêj berde

Hêvî heye ku tu têkevî cemaetekê, rojek were  
 Bibî serokê wê cemaetê û ew îftixar bikine bi te

**XULEFAYÊ RAŞIDÎN**

Şahidîyê dikim ku ji bilî Xwedê tu xweda tunene  
 Û dîsan şahidîyê dikim ku vejîn heq e û rasteqîn e

Bêguman destika îmanê gotineka zelal û pak e  
 Karekî paqij e ew bi ser da kêma û zêde jî dibe

Bêguman Ebûbekir xelîfeyê Xwedayê xwe ye  
 Ebu Hefse<sup>11</sup> ji bo kirina xêrê yek ji çavSORAN e

Rebbê min! Şahid be ku Osman xwedî fezîlet e  
 Û tu guman tune ku fezîleta Elî jî taybettir e

Bimeşin di şopa wan da, ew serokên umetê ne  
 Ên wan şermezar dikin leneta Xwedê li wan be

---

<sup>11</sup> Ebû Hefse, leqeba Hezretî Omer e ku ew xelîfeyê duyem ê Îslamê ye. (N. Sönmez)

## ILIM NÛR E

Îmamê Şafi'î dibêje: “Min di heftsaliya xwe da Qurana Pîroz û di dehsaliya xwe da jî el-Muwetta<sup>12</sup> jiber kir.” Digel vê yekê ew, gazindeyan ji bêquwetîya jiberkirina xwe dike û weha dibêje:

Min, ji Wekî<sup>13</sup> ra kir gilîyê qelsîya hişê xwe  
Ji min ra got: Wê demê dev ji gunehan berde

Wî, ez hişyar kirim ku ilim û zanîn, ronahî ye  
Û kesê gunehkar jî ji ronahîya Xwedê bêpar e

---

<sup>12</sup> el-Muwetta, Kitêba Îmamê Malik (711-795) e û herweha yek ji heft kitêbên (Kutubê Sitte) Hedîsê ye. (N. Sönmez)

<sup>13</sup> Wekî' kurê Cerrahî ye, yek ji muhaddîsên Iraqê ye, di sala 129/746an da li bajarê Kûfeyê hatiye dinyayê û di sala 197/812an da li heman bajarî wefat kiriye. Hinek berhemên wî ev in: Tefsîra Quranê, Sunen, el-Me'rîfetu't-Tarîx, ez-Zuhd. (N. Sönmez)

## COMÊRDÎ

Eger hûn nebin comerd wê gelek bûyer werin serê we  
Lewra dikare bibe destvekirî yan jî destgirtî, destê we

Eger hûn bibin destgirtî û dûr bisekinin ji camêrîyê  
Ewê دنیا bi diranê kursî we bicû wê çî hevî be ji we

Dibe ku dewran şûnda bigire tiştên ku berê dabûne we  
Bi rastî xwîyê dewranê ye tiştê ku dide şûnda dixwaze

## HEZKIRINA JI EHLÊ BEYTÊ

Hey Siwaro! Bisekine li ser xîçkirîyên Mînayê  
Bang bike li sekinandî û rûniştîyên ber perê çîyê

Di dema seherê da diherikin hecê ber bi Mînayê  
Ew bi coş in wekî pêlên perpitî yên çemê Feratê

Rafizîbûn were hesibandin hezkirina ji Ehlê Beytê  
Bila tevahîya îns û cinan şahid bin ku ez rafizî me

**CEFA**

Ez ne ew mirov im ku dema hevalekî wî lê bike cefa  
Ew dest bi tewanbarîya wî bike û bide dijûnan jê ra

Berevajî dema hevalekî li min bike ezîyet û cefa  
Ez vedigerim li wî bi hezkirî û dest dirêj dikim jê ra

Eger tevbigere li gor xwe wî dikim bar ji xwe ra  
Helbet ez im ewê çavên xwe digire ji kêmasîyên te ra

**HEZKIRINA JI SALIHAN**

Xwedîyê qenaetê, dibe ezîzê nefsê  
Ji bo mexlûqan eger veneke pêjgîrê

Tecrubeyan nîşanê min da li ser şerefê  
Ma gelo heye tiştêk ezîztir ji qenaetê

Ji bo nefsa xwe bixîne sermîyan wê  
Paşê jî hewceye hebe malê teqwatîyê

Nebe bendeyê nefsa xwe, ji bo Xwedê  
Bi qasî quweta xwe bike xêr û hesenatê

Hez dikim ji kesê salih welew nebim jî wekî wê  
Hêvî dikim ku bi wî ra xwe bigîhînim şefaetê

Nefret dikim ez ji bazirganên gunehkarîyê  
Her çiqas hebe li cem me jî ji heman malê



**ADABÊ NESÎHETÊ**

Dema ez mam bi tenê bike li min nesîhetan  
 Nebî nebî di nav civatê da li min bikî şîretan

Şermezarkirin e li cem mirovan kirina şîretan  
 Naxwazim guhdarî bikim ji ber van sedeman

Eger nepejirînê gotinên min û neçî li pey wan  
 Ne şaş bibe ne jî bi hêrs bikeve ji îsyankaran

**NEDÎTINA KÊMASÎYÊN XELKÊ**

Ger mirov xwedan hiş be û bitirse ji kirina gunehan  
Teqwatî nahêle ew bibîne gunehê filan û bêvanan

Çawa êş û jana nexweşekî derdixîne tengasîyan  
Nahêle hîs bike êş û jana nexweşîya filan û bêvanan

### ÇAVBIRÇÎTÎ KEPAZETÎ YE

Ilmê min bi fayde be, ji min ra bes e  
Lewra koka kepazetîyê çavbirçîbûn e

Hezkerên Xwedê helbet vedigerine  
Xwe dadiweşînin ji gunehên ku kirine

Rast e balinde difirin û bilind dibin  
Lêbelê çawa difirin wisa jî datînin

## BITIRSE JI NIFIRÊN MEZLÛMAN

Şerkirina bi hinek zaliman ra bêzar dike te  
Lê qederê ji wan ra dafikek li dar xistiye

Îslam, ji bo min bi tenê kirina îbadetê ye  
Û diayê ku ji zirxan baştirîn diparêze ye

Her çiqas tu hesab dikî ku zalim xilas bûye  
Lê diayê wekî jehrîya Qîsê<sup>14</sup> bitesîr li pey wî ye

Mûyên li paş tîrê, bijangên çavên bêxewîyê ne  
Û bijang, hêstirên çavan di xwe da dihewînine

---

<sup>14</sup> Qîs, navê bajarekî Sumerîyan e, vê gavê di nav sînorê Iraqê da ye û ev bajar bi çêkirina jehrîyê navdar e. (N. Sönmez)

### ÂŞIQ JI MEŞÛQ RA SERÎ DITEWÎNE

Îsyankarî lê, xwe wekî hezkerekî Xwedê nîşan didî  
Ev bêşik tişteki ne mimkûn e û tu jî baş dizanî

Eger eşqa te rasteqîn ba, teqez te ditewand serî  
Bêguman aşiq ji meşûqê xwe ra ditewîne serî

Dide destpêkirinê ji te ra her rojekê bi nîmetekî  
Helbet hewceye tu eda bikî şukr û spasîya vî tiştî

**TERIKANDINA ŞERAN**

Gelek caran gotinên ecêb dibîhîzime  
Gava tene bîra min, dilê min pê diêşe

Ji bo xwedîyê wan gotinan, beşîşî dibime  
Her wekî kêfxeş bim jî ji tiştên dibîhîzime

Tevgerandina min a bi vî hâlî dibe ku ecêb be  
Hêvîdar im terikandina şeran, şeran biqedîne

**ÇAVNEBARÎ**

Çavnebar xeyba min dike, dema min nebîne  
Dema dibihîzim wekî salihêkî pesnê wî didime

Ji kurtepista di pişt wî da, Xwedê min biparêze  
Xem nîne bila ew di pişt min da xeyban bike

## QENAET Û ÇAVBIRÇÎTÎ

Bende azad e, eger xwedan qenaet be  
Azad jî bende ye, eger çavbirçî be

Xwedî qenaet be, ji çavbirçîyan nebe  
Tu bizan çavbirçîtî tişta herî bi qirêj e



**NEŞERMKIRIN**

Eger namûsa xwe neparêzî û natirsî ji Xaliqê xwe  
Lê şerm dikî ji mexlûqan, wê demê çî dixwazî bike

## DOSTÊ RASTEQÎN

Eger mirovek bi dilnexwazîyê bike hevaltîyê bi te ra  
Biqete ji wî û bi devberdana ji wî jî qet xemgîn nebe

Însanên baş pir bin jî di terikandinê da rihetî heye  
Welew cewr û cefa hebe jî, ji bo yarê dil bi sebr e

Tu ji kê hez bikî, ma dilê wê vedigere bi bal te ve  
Wisa jî her ew ê tu jê hez dikî ew nabe yar ji bo te

Eger di tebîeta însanekî da hezkirineka paqij tune be  
Di dostanîya bêdilî da jî bi tu awayî tune ye fayde

Xêr nayê ji mirovê bi dostê xwe ra xayîntîyê dike  
Piştî hezkirinê cewr û cefa tişteki çiqas dilsoj e

Jîyana derbasbûyî herwekî qet nejîyayî dihesibîne  
Sirên doh veşartibûn îro li derûdora xwe belav dike

Selam ji dinya derewîn ra ku eger têda hebine  
Kesên ji dil, dost, xwedîyê gotina xwe û bi wîjdan

**EBÛ HENÎFE**

Welat û hemwelatîyên xwe xemilandîye  
Rêber û rêzanê misilmanan Ebû Henîfe

Bi hikmên xwe, bi hedîsan û bi fiqha xwe  
Ew wekî ayetên Zebûrê li ser rûpelan e

Ne di bakûr da mirovekî mîna wî derketîye  
Ne jî li rojava û Kûfeyê kesekî wekî wî heyê

Hezar car rehmeta Xwedê li ser wî be  
Heta kitêbên wî werine xwendin bi fayde

**XWEGÎHANDINA YARÊ**

Xwegîhandina yarê ka wê çawa be  
Çîya, gir û ecel di navbera me da ne

Bi halê pêxwasî û bêwesayîtî, ma dibe  
Bi ser da destvala ye û rê jî bê ewle ye

**HÊZ NE HERTIŞT E**

Digel hêza xwe keçelok xwedî dibe bi leşên çolan

Moza hingiv a bêhêz jî berhev dike hingiv li kewaran

**SIR**

Gelek mirov hene bihêz û xwedan hiş in  
Riziq tê û diçe, lê rêya wê nakeve mala wan

Ew çiqas mirovên kêmaqil û bêquwet in  
Tu dibê avê bi çöçikê derdixin ji kendavan

Ev rastîya jî dide xwîyakirin û nîşandan  
Sirek heye ji bo Xwedê lê ew nayê zanîn

## BIÇE JI CIHÊ XWE

Derkeve biçe ji welatê ku têda zilim tê kirin li te  
Bi sedem dûrketina ji malbatê jî di xwe da neşewite

Ma kî di welatê xwe da di nav malbata xwe da zelîl e  
Bes derketina xerîbîyê ji bo te exlaqê herî baş e

Embera<sup>15</sup> xam wekî pişqulê hûtan e di cihê xwe de  
Lê dibe xemla hustîyan piştî derketina ji welatê xwe

Kil, di cihê xwe da cureyek ji cureyên keviran e  
Tu dibînî, kevîrê serê rê û dirban e di welatê xwe de

Dibe xwedîyê tevahîya qîmetan ew, bi çûyîna ji cihê xwe  
Tê kişandin ew di navbera qapax û bîbokên çavan da

---

<sup>15</sup> Ember, cureyekî bêhnxeşan e û ji navzika karxezalê derdikeve. (N. Sönmez)

## ŞİRÎNÎYA ILMÊ

Di bêxewîya şevan da senifandina ilmê xweşiktirîn e  
 Ji xanimeka bedew, xweşbîhnê û xemilandî ji min ra

Dengê xişînîya pênuşa min li ser kaxizê xweşiktir e  
 Ji rastîhevhatina bi mirovan û uşaqan ra ji min ra

Lêdana min a rûpelan ji bo birina toza di nav wan da  
 Ji keça defjena ku li defa xwe dide şirîntîr e ji min ra

Di dersê da bi kêfxweşî hûrbûna di mijareka ilmî da  
 Ji belavkirina şeraba saqî çêjtir û lezzettir e ji min ra

Şevên te bi xewê yê min bi bêxewîyê derbas bûne  
 Tu yê çawa bikaribî xwe bigîhîni min di vê rewşê da



**NESÎB**

Eger kesek xwedan şans bêje: Min şitleka darê dîtîye  
 Û ew şitl di destê min da fêkî dide, pê bawer bike

Eger te bihîst li ser kanîyekê rebenokek û belengazek  
 Di vexwarina avê da xeniqîye wê gotinê tesdîq bike

Eger lîstikên dewlemendîyê bixwazim bi kar bînime  
 Helbet bikaribim bigirim stêrkên li asîman belavelane

Bi piranî kesên aqilmend bêparin di dewlemendîyê de  
 Aqilmendî û dewlemendî du taybetîyên ji hev cuda ne

Derdkêş û bendeyên Xwedê yên herî rasteqîn dizanin  
 Kesên xwedan hîmet ew bi rizqekî kêrî îmtîhan dibin

Ji nîşaneyên piştrastkirina qeza û qederê yek jî eva ye  
 Aqilmend di tengasîyê da be ehmeq di xweşîyê da ye

Riza Xwedê ne têda, ew ê zengînî bûye nesîb ji wî re  
 Ne xêr bi destê wî dikeve ne jî hemd dike ji Xwedê re

Nesîb tevahîya karên bê serûbin teqez nêzîktirîn dîke  
Nesîb derîyê li pêşîya mirov hatiye kilîtkirin vedîke

**EHMEQ**

Eger mirovek bi zimanê xwe aşkere bike sira xwe  
Û ew were şermezarkirin ji aliyê xelkê ve ew ehmeq e

Eger dilê te bi veşartina sirekê teng û ne rehet be  
Dilê nikaribe emanetekê veşêrîne ew ji sirê tengtir e

**BIBE AGIR**

Li cem mirovan tenê dekbazî û durûtî maye  
Di destlêdanê da dirî, di tamkirinê da jehrî ne

Eger mecbûr mayî bi jîyaneka di nav wan da  
Li ser wan bibe agir û dirîyên wan bişewitîne

**HEZKIRINA JI WELAT**

Tirs û sawa dizan, li ser mirovê xerîb heye  
Îtaetkirina deyndar û zîleta kesê bêçare heye

Dema mala xwe û welatê xwe bi bîr tîne  
Wekî baskên çûkê dilê wî gimûgim dike

**TEWEKUL**

Bo rizîq tewekula xwe didim Xaliqê xwe  
Ez bi bawer im her Xwedê ye yê rizqan dide

Ji destê min qet naçe eger ew rizqê min be  
Welew ku ew di binê deryaya bêbinî da be

Xwedayê ‘Ezîm, wê bi mezinahîya xwe tîne  
Welew zimanê min nizanibe jî gotinê bêje

Ka nefis hesreta çi dikişîne û çima diperite  
Digel Xwedê rizqê mexlûqan jî parve kirîye

**HER TIŞT BI AQIL NÎNE**

Eger tu gihiştibayî daxwazên xwe tenê bi aqilê xwe  
Wekî kesekî riziqmend, nedihatî dinyayê û nediçûyî

Digel nezanîya te, wî dîsa jî milk da te û tu pê dijî  
Yekem mecnûnê ku rizqê wî hatîye dayîn tu nînî

**ILIM JIBERKIRIN E**

İlim li ba min e, ez li ku bim jî jê sûd werdigrim  
Dilê min kewara ilmê ye ne hundirê sindoqê ye

Eger ez li mal bim, ilim di mal da li kêleka min e  
Eger ez li çarsû û sûkan bim ilim li çarsû û sûkan e



**ZIRARDAYÎNA BÊHEMDÎ**

Bêhemd zirardayîn bi armanca kirina qencîyan  
Carnan kirina qencîyan dibe sedema ne qencîyan

Bi armanca kirina qencîyê bêhemd zirar tê dayîn  
Car caran kirina qencîyan dibe sedema ziraran

## NIVÎSÎN

Ilîm nêçîr e nivîsîn jî girêdana wî ye  
Ha! Bi werîsê zexm girê bide nêçîra xwe

Çi ehmeqî ye karxezala ku nêçîra wî ye  
Wê serberdayî di nava xelkê da berdide

**HEQ**

Heqê xwedîyê heq bizane  
Dema heq bike heq ê wî ye  
Xêr tune di înkariya heq da  
Heq, xwedîyê heq e  
Eger ew heq, heq bike

**KARÊ XWE BI XWE BIKE**

Tu kes gurê te wekî nêngên te naxurîne  
Nexwe bike tevahîya karên xwe bi xwe

Eger hewcedarîya te bi alîkarîyekê hebe  
Hilbijêrîne ji xwe ra ew ê dizane qedrê te

**BEXTREŞÎ**

Yek ji bextreşîyên eşqa te ye  
Meşûqa te aşiqê kesekî din be

An jî fikra te qencîxwazîya wê ye  
Lêbelê ew daxwazkarê zerara te ye

**ZAR Û ZIMAN**

Ji zar û zimanê mirov kesekî xelas nabe  
Welew ku ew pêxemberekî têrpaqij jî be

**QENAET**

Min dît ku qenaet dewlemendî ye  
Lewra min bi dest û lepan pê girtîye

Li ber derê wî, qet kesek min nabîne  
Û bi stuxwarî qet kesek min nabîne

Bi vî awayî bê dîrhem dewlemend bû me  
Wekî qiralekî di navbera mirovan da me

**FITNEYA HERÎ MEZIN**

Fitneya herî mezin bêxemiya alim, ji gunehan ra ye  
Ji wê jî mezintir rewşa zahidê nezane ger misilman be

Ew her du fitneyên were mezintirîn in di dinyayê de  
Li gor wan diceribînin dînê xwe, yên bi wan dihesine



**RÛNÊ MIBAREK**

Min dipijîne di nava rûn da û dibêje: Mibarek  
Çawa dişewitîne û diperitîne cîgeran ev mibarek

## **FAQIH, SEROK Û DEWLEMEND**

Faqih bi kirina kiryarên xwe faqih e

Ne bi gotin û axaftinên xwe faqih e

Herweha serok jî bi exlaqê xwe serok e

Ne bi qewmê xwe û mirovên xwe serok e

Zengîn jî bi hal û hereketên xwe zengîn e

Ne bi mal û milkê xwe ew dewlemend e

**NEFSA XWE BIPARÊZE**

Nefsa xwe biparêze û wê bibe li cihê baş terbîye bike  
 Bijî bi saxî û selametî, wê xweşik bibine gotinên te

Eger bi qencîkarîyê danûstandinê nekî bi mirovan re  
 Tu yê bikişînî ji demê û bibînî cefayê ji dostên xwe

Eger rizqê îro têrê neke jî, hetanî sibê bi aram be  
 Hêvî heye tengasîyên demê wê derbas bibin ji te

Eger mirov du rû be, ji hevaltîya wî qet xêr çênabe  
 Li gor bayî tevdigere û bi alîyê wê da ditewîne xwe

Dost û heval dema tu bihejmêrî ew çiqas zêde ne  
 Lêbelê ew çiqas jî kêr in, di dema tengasîyan de

**DEM MIN PERWERDE DIKE**

Bi demê perwerde dikim xwe

Dibînim kêmasîyên aqilê xwe

Dema zêdetir dikim ilmê xwe

Zêdetir dibînim nezanîyên xwe

**FERQA ZANA Û NEZAN**

Mirov, alim nayê dinyayê bizanibe  
Ehlê ilmê jî nezan nîne bizanibe

Eger mezinê qewmekî nezan be  
Welew xwedî hurmet be jî piçûk e

Eger piçûkê qewmekî zana be  
Welew xwedî hurmet nebe jî mezin e

Ji jîyaneka bêilim ra hiç razî nebe  
Mîrata pêşîyên te, nabe nesîbê te

**ILIM DEMEKA DIRÊJ DIXWAZE**

Ne mimkun e xwe bigîhîne hîkmetê  
Ew ê temen diborîne bi karê malbatê,

Bi tenê yê ciwan bi dest dixîne ilmê  
Eger dût bixe xwe ji karûbarê dinê

Eger Hekîmê Loqman bihata ceribandinê  
Ku wî dibir bi xwe ra siwar bi zanînê

Bi dinyayê bi zarûzêçan û bi feqîrîyê  
Nikarîbû cuda bikira hejîr ji hêşinahîyê

**QIRAL BELA NE**

Qiral bela ne ji bo cih û warên ew lê ne  
Bila siha te jî neçe di ber derê wan re

Di hêrsê da zilmê dikin li millet, bifikire  
Lê dema kêfweş bin, dev berdidin ji te

Here cem kerema Xwedê û ji wan dûr be  
Bêguman sekinandina li cem wan zîlet e

**EHLÊ BEYTÊ Û XULEFAYÊ RAŞIDÎN**

Dema ku em pesnê Elî bidin

Rafizî ne em, li gor nezanan

Qala fezîleta Ebûbekir bikin

Dijminê Ehlê Beytê ye, dibêjin

Hetan mirinê ez im hezkerê wan

Welew tu dujminê wan î, bibêjin



## HEZKIRINA JI EHLÊ BEYTÊ FERZ E

Eya Ehlê Beyta Resûlê Xwedê! Hezkirina we  
Hatîye ferzkirin<sup>16</sup> di Qurana ku Xwedê şandîye de

Ji we ra bes e wekî fexreka mezin hezkirina we  
Ew ê selatan neyîne li ser we nimêja wî ne qebûl e<sup>17</sup>

<sup>16</sup> Îşaret bi bal Sûreya Ehزابê ayeta 33yan e. (N. Sönmez)

<sup>17</sup> Binêrin: Nesaî, Sunen, Kîtabu's-Sehv, Bab 49. Li gorî mezhebê Şafi‘îyan anîna selatan li ser Hz. Pêxemberî û li ser alê beyta wî di nimêjê da, di teşhuda dawîyê da ferz e. (N. Sönmez)

## ÇAVNEBARÊN BID‘ETÊ

Heta di dîn da dernexînin bid‘etan dilê wan rihet nabe  
Li gor xwe tevdigerin û dîkin karên Resûlan nekirine

Hetta piranîya wan dînê Xwedê Teala piçûk dibîne  
Ma nizanin wezîfeya wan tenê rîayetkirina rîsaletê ye

**MUNAZERE**

Emelên dûr û dirêj min dişînin xerîbîyê  
Eger bixwesta dikir karê aqilê min nedibirî jê

Ji bo bêjin xislet e ez nabînim ehmeqîyên wê  
Eger heba hişê wî helbet diketim pê ra pêşbazîyê

**EHMED BÎN HENBEL**

Ji min ra gotin: Tu Ehmed ziyaret dikî yan ew te

Min got: Dilpak cih venaqetînin di qonaxan da

Eger ew were zîyareta min, ev ji dilpakîya wî ye

Ez biçim bo dilpakîya wî diçim, ê dilpak ew e

**JEHRÎ Û HINGIV**

Eger tu bi ser ketî îkram bike ji wan ra jehrîyê  
Ha! Ji bîr neke şirînîya zimanê xwe têxe navê

**TEBÎB**

Tebîb hat min muayene bike lê min ew kir muayene  
 Min xwest bizanibim çi hatîye serê wî û halê wî çi ye

Ew nexweşê giran e hema dixwaze min derman bike  
 Ji ecêban e bi çavên nedîtî dixwaze çavan kil bike

## EHLÊ ILMÊ PAYEBILIND E

Min dîtîye ehlê ilmê dibin ji payebilindan  
Welew ji nemerdan jî bin bavên wan zarokan

Ewqas zêde bilind dibe pileya camêrtîya wan  
Serdestên wan bi bêhemdî didin pesnê wan

Di her şert û mercê da diçin ew li pey şopa wan  
Wekî kerîyê pez diçêrin û diçin li dû şivanan

Eger tune ba ilim mirov nedibûn ji dilxweşan  
Agahdar nedibûn ne ji helalan ne jî ji heraman

## SÊ NEXWEŞÎ

Sê tişt hene mirovan dibine helakê

Mirovê bi saxî diçe bal nexweşîyê

Doxinsistî û berdewamîya şerabê

Bêhezimkirin xwarina li ser xwarinê



## ILIM HEQÊ KÊ BE BIDE WÎ

Ma mircanan bireşînim di nava naxirê da  
Ma gotinên vala bidim rêzê ji şivanên pez ra

Sond be ger wenda bibim jî di xerabeyên herêmek da  
Wenda nakim gotinên hene têda wateyên giranbiha

Eger Xwedayê Ezîz bi lutfa xwe hêsan bike ji min ra  
Ez û ehlê ilm û hîkmetê rastî hev werine di rêyekê da

Ezê ên bikêr belav bikim di berdêla hezkirina wan da  
Eger nebe ez ê xwe veşêrînim bi zanyariyên xwe ra

Ê ilm û zanîne dîyarîyî nezanan bike wê dike wenda  
Kî jî wê nede alim û zanaya ew maye di nav zilmê da

**GAZINDE**

Xerc dikim tevahîya malê di ber destê xwe da  
Welew şevên dirêj biborînim di birçîbûyînê da

Xwe dewlemend nîşan didim di nav hevalan da  
Vedişêrim ji wan rewşa xizanîya ku ez im têda

Gazindeyên xwe tenê dikim ji Xwedayê xwe ra  
Ê baştir dizane rewşan Xwedê ye, dibêjim ji wî ra

## DOXINSISTÎ DEYNDARÎ YE

Xwedî îffet bin bila pîrekên we jî xwedî îffet bin  
Dûr bisekinin ji kiryarên ne layîqî misilmanan in

Bêguman kirina zinayê deyn e û şûnda tê girtin  
Bizanibe teqez ew deyn ji malbata te tê girtin

Ey eşqîyayê ku çav berdide namûsa mirovan  
Û qut kirîye rêya hezkirinê, tu yî ji bêheysîyetan

Eger tu azat bibayî ji malbatên bêheysîyetan  
Teqez nedibûyî ji êrîşkarên namûsa misilmanan

Bêguman ew ê zinayê dike bi wî ra zina tê kirin  
Pêşgarî mala wî nebe jî bi dîwarê wî ra tê kirin

**MIN TU CERIBANDÎ**

Min tu ceribandî lêbelê tu mayî li paş min  
Tu bes î wekî mamosteyê perwerdeya min

**MINACAT**

Dûr im ji şerefa te ya mezin û di meqamê zîletê da me  
Sirra te ya veşartî nikarim dorpêç bikim bi zanîna xwe

Ez bi serî tewandinê û bi mikurhatina li zelîltîya xwe  
Gazî te dikim û dixwazim barana rehmet û kerema te

Bi hinek sifetên navên te yê n xweşik dikim dia ji te re  
Dihele winda dibe nesr û nezm di mezinahîya wan de

“Elestu bî rebbîkum<sup>18</sup>” peymaneka kevnare ye  
Ey meçhûlê ku hatîye naskirin bi navên xwe

Ey saqîyê aşiqên xwe naqehirîne û wan tî nake  
Bide tamkirin bi me jî şeraba wê dostanîya xwe

---

<sup>18</sup> “... ma ez ne Xwedayê we me...” Sureya E‘raf 7/172

## MINACAT

el-Muzenî rîwayet dike û dibêje: “Dema Şafî‘î di ber nez‘ê da bû (li ber mirinê bû) ez çûm cem wî û min jê ra got: “Tu çawa bûyî?” Got: ‘Ez ji dinyayê diçim, ji hevalan diqetim, ava mirinê vedixwim û bi bal Xwedayê Celîl ve vedigerim. Gelo ruhê min diçe cenetê ez wê pîroz dikim an jî diçe cehenemê êşa wê parve dikim, wellahî nizanîm.’ Û paşê jî girîya û ev helbest xwend:

Bitirse ji Xwedê ji bo musîbetan jî bi hêvî be  
Neke bi xebera nefsa xwe û poşîman nebe

Tirs û hêvîkirin, di navbera herduyan da be  
Eger tu Misliman î mizgînîya ‘efwa Xwedê bide

Dema dilê min hişk bibe û rêya min teng bibe  
Hêvîyê ji xwe ra dikim pêlekan ji bo ‘efwa te

Ey Îlahê Mexlûqan! Dişînim ji te ra daxwazên xwe  
Ey Keremkar û Qencîxwaz! Gunehkar bim jî bi xwe

Gunehên min zêde ne, lê ew qîyas kirin bi ‘efwa te  
Xwedayê min! Ji gunehên min zêdetir e ‘efwa te

Tu yî ew ê dikare bibexşîne tevahîya gunehên me  
Tu yî qencîxwazê me, bexşende û keremkarê me

Eger tu min bibexşînî, te kesekî îsyankar bexişandîye  
Wekî misilmanek were jî ew bi tenê zalimekî xedar e

Eger tu ji min întîqamê bigirî jî ez bê hêvî nabim ji te  
Welew têkevim cehenemê jî bi sebab gunehên xwe

Her çi qas zêde bin jî gunehên min yên berê û yên teze  
Ey Xwedîyê ‘Efwê! ‘Efwate mezintir û berfirehtir e

Eger tu nebî kesek nikare li dijî Îblîs berxwedanê bike  
Çawa bikaribe wî dostê te yê bijarte Adem xapandîye

Xwezîka min bizanîba diçim cenetê û dilrihet dibime  
Yan jî dikevime agirê cehenemê û poşîman dibime

Karê wî ‘arifê nazik û kubar bawer bike bo Xwedê ye  
Derbasî sînorê cezbeyê dibe û ji çavên wî xwîn dibare

Ew radibe tehecudê dema şev dirêj dike tarîfîya xwe  
Bayek matemê tê ji dijwarîya tirsê bi ser nefsa wî de

Herikbar dibe zimanê wî dema zikrê Xwedê dike  
Fetlok dikeve zimanê wî dibe ecemî dema jê neaxive

Dikeve bîra wî rojên ku di ciwanîya wî da derbas bûne  
Wan gunehên ku wî di wan deman da bi nezanî kirine

Kul û keder dibin hevalên wî di rojên wî yên dirêj da  
Dibe hevalê bêxewî û bêdengîya şevê di şevên tarî da

Yara min! Daxwaz û miradê min tenê tu yî, dibêje  
Tu besî wekî xenîmeteka ji daxwazkar û hêvîdaran re

Tu ninî yê ku berê ezab dide min paşê jî hîdayetê dide  
Ew ê bi berdeyamî lutfa xwe û nîmetên xwe dide me



Hêvî heye were bexîşandin kesê ku îhsan bo wî heye  
Hêvî dikim sucê min ê berê were perdekirin li cem te

## FEZÎLETA ILMÊ

Yek ji fezîletên ilmê ye ku yê jê ra dike xizmetan  
 Ilim dike xizmeta wî mirovî, tevahîya mirovan

Wacib e mirov biparêze ilmê xwe ji şerê mirovan  
 Çawa diparêze namûs û nefsa xwe ji şerê mirovan

Kesekî bibe ehlê ilmê û bi nezanî wî nede zanayan  
 Bila bizanibe ku wî zilim kirîye li ilmê û li aliman

Ew mirov dişibe wekî kesekî hostayê avahîyan  
 Û piştî çêkirinê dixwaze hilweşîne wan avahîyan

**ŞEV Û ROJ**

Kevirê aşê şev û rojan, wisa dizivirin  
Bi mûyên spî tijî kirine porê serê min

Goşt û xwîna me, ev her du profesyonelan  
Didizine bi awayekî aşkere û li ber çavan

## XWEDÊ YA DILAN DIZANE

Xweşikîr bike kincên xwe hetanî ji destê te tê  
Kinc, xemla mirov e bi wê dibîne îzet û îkramê

Kincên bêteşe li xwe neke bi armanca nefspiçûktîyê  
Him bi tiştên eşkere him jî bi yên dizî dizane Xwedê

Ne mimkun e kincên te yên teze bidine te zîrarê  
Eger tu xwe biparêzî ji heraman û bitirsî ji Xwedê

Kincên kevin pileya te bilind nakin li bal Xwedê  
Eger tu bendeyê ku bi gunehan hatibî lewitandinê

**ŞERTÊ BIDEŞTÎSTINA ILMÊ**

Hevalo! Ilim tê bidestxistin bi şeş tiştan  
Ez ê bêjim ji te ra hûrgulîya wan her şeşan

Zeka, xirs, xebat û têrêkirina berjewendîyan  
Demên dirêj û bi mamosta ra kirina suhbetan

## CAMÊRÎYA NEFSÊ

Qenaeta min heye ji bo rizqê zemanê min  
 Bindestî qedexe kirîye ji nefsa xwe ra min

Gelek zêde ditirsîyam ji gotegotên mirovan  
 Qencîya filankesî ye ji bo bêvankesî bibêjin

Naxwazim mal û milkê wan mirovan  
 Eger bikin li min zilmê jî nakim xeman

Ew ê bi çavê piçûkatîyê mêze dike li min  
 Dibînim wî bi heman çavê ku ew dibîne min

Ew ê bi çavê mezinatîyê mêze dike li min  
 Ez dibînim wî di wî da, bi tevahîya maneyan

**HAY JI ZIMANÊ XWE HEBE**

Ey mirov! Xwe biparêze ji zimanê xwe  
Ziman wekî mar e bila ew bi te danede

Bi sedan qurbanîyên zimên, di goran da ne  
Qehreman jî ji rastîhevhatina wan ditirsin

## KÊMASÎYÊN ME

Em lomeyan li demê dikin lê ‘eyb a me ye  
 Ji xeynî eybên me, tu eybên demê tunene

Em dema li bêşûc û bêguneh, hîcvan dikine  
 Eger xwedan zar û ziman ba wî jî fikir li me

Tu kesekî dîtîye guran goştê guran xwarine  
 Lê berbiçav e hinekên me hevudin dihêrine

Hinekên me ji gurên di postê berxan da ne  
 Delîl li halê wî be ku bela xwe bi me dide

Dîn û dîyaneta me, hevudin xapandin û rîyatî ye  
 Karê me xapandina kesên li me mêze dikine



**ÎBRETGIRTIN**

Bi zordestî hukim kirin û bûne ji tûndrewan  
Piştî demekê qet nema tesîra kiryarên wan

Bi însaf bana însaf dihate kirin lê ew har bûbûn  
Demê barandîye dilêşî û belayên xwe li ser wan

Wer bibûn, lîsanê hal dixwend helbestên wan  
Dem bêguneh e ew in encamên kiryarên wan

## QEDER

Her çiqas ez nexwazim jî daxwazên te bi cih tên  
Welew tu nexwazî jî bi cih nayên daxwazên min

Te bendeyên xwe li gor ilmê xwe afirandibûn  
Di navbera ilmê te da ciwan, kal û pîr tên û diçin

Hinekên wan xemgîn in hinekên wan dilxweş in  
Hinekên wan delal in hinekên wan xêrnexwaz in

Tu hinekan dihêlî bi tenê û dibî lutifkarê hinekan  
Dibî alîkarê hinekan û qut dikî alîkarîyê ji hinekan

**ŞÎRET**

Eger dixwazî helak nebî û bijî bi saxî û selameti  
 Û dîndariyeka bêkêmasî û namûsa te jî parastî

Nebî nebî tu kêmasîyên xelkî bînî ser zar û zimanî  
 Mirov jî xwedan çav in, tu jî xwedîyê pir eybanî

Dema çavê te xwest eyban ji te ra bike berdestî  
 Bêje ey çavo! Çav hene ji bo wan mirovan jî

Bêhnfireh be li hember nebaşan û li ser qencîyê bijî  
 Bi başîyê xwe biparêze eger, dixwazî xwe biparêzî

**SÛÎZEN**

Bigire û dayîne alîyekî husnuzena xwe  
Sûîzen zîrektîya aqil, a herî biquwet e

Ê ku li serê mirovan teşqeleyan dikine  
Gelo husnuzen û gotina xweş nînine

**KEŞTÎYA MU'MINAN**

Bendeyên wisa hişmend hene, ji bo Xwedê  
Dişemirînin dinyayê û ditirsin ji fitneyê

Wan wiha digotin dema mêze dikirin li dinyayê  
Bêguman ev der hîç welat nîne ji bo jîndarîyê

Lewra wan dinya xwe kirine wekî behrê  
Û emelên xwe yên salih jî kirine wekî keştîyê

**DADPERWER BE**

Bikişîne bi terazûya ku ew te pê dikişîne  
 Ew te bi çi dikişîne tu jî wî bi wê bikişîne

Biçe cem wî kesî ku ew jî tê cem te  
 Pişta xwe bide wî kesî ku cefayê dide te

Ew kesê ku ji xwe piçûktir dibîne te  
 Wî di halê wî da bihêle û bê qîmet bike

Û vegere bi bal Xwedayê bendeyan ve  
 Vegere li wan tiştên ku ew dişîne ji te re

## ÇAVÊN BÊXEW

Çavan nedî xewên şevan û çav di xewê da ne  
 Çav, di nav karên bûyîn û nebûyînê da ne

Li gor quweta xwe xemgînîyê dûr bixîne ji xwe  
 Piştkirin û xemxwarina xemgînîyê dîntî ye bo te

Rebbê te di karên doh da çawa kir têra te  
 Bêguman ji bo karê sibê jî wisa dike têra te

## ÇAVBIRÇÎTÎ

Min kuşt dildarîya xwe û rihet kir nefsa xwe  
Bêguman bi çavbirçîtîyê nefs piçûktir dibe

Min jîndar kir qenaet, ew mirî bû lewra  
Parastina namûsê heye di jîndarîya wê da

Eger çavbirçîtî pêjgarî dilê bendeyekî be  
Encam, jîyaneka bi zîlet û nemerdî ye



**AXAFTINA PÛÇ Û VALA**

Tuneye xêr di axaftina pûç û vala da  
Eger tu dixwazî ya rastî di eslê xwe da

Bêdeng mayîn xweştir e ji ciwan ra  
Ji axaftina ne di rê û ne di wextê da

Teqez dîyar dibe kesayeta ciwana  
Di vekirin û ronahîya enîya wan da

**MIRINA HEZKIRÎYÊN ME**

Ez bi aram dibim li pêşberî tengasîyên ku tîn  
Îro nebe jî teqez sibê derdikevine pêşberî min

Welew teslîm bibim jî dost dimire berîya min  
Mirina dostan ya berîya min, dikeribîne min

**MINET**

Dibînîm ku tu bi hesinê minetê hatîyê daxkirin

Qey tu xwedan par î ji bo roja afirandina min

Parîyek nan bes e, min azad bike ji van baran

Di jîyana min da hetanî roja kefenkirina min

## SERXWEŞÎ

Ez hatime serxweşîya te, ji ber ku sineta dîn e  
Daxwaza min nîne jîyaneka heta hetayî mayînde

Di serxweşîyê da, ne ew ê sersaxîyê dide baqî dimîne  
Herçiqas bi qasî demekê bijî jî ewê dide jî dimîne

## EFTALÊ ILMAN

Îmamê Şafi‘î dibêje: “Ez dema kesekî rîwayetkarê hedîsê dibînim herweku min ji sehabîyên Resûlullah (sxl) kesekî dîtîye xwe hîs dikim. Xwedê ji wan razî be, wan hîmê dînê me ji bo me parastine, ji ber vê sedemê ew di warê fezîletê da ji me qenctir in.” Û piştî vê gotina xwe vê helbestê dibêje:

Ji bilî ilmê Quranê tevahîya ilman meşxûlîyet e  
Lêbelê ilmê hedîsê û fiqha dîn ne di nav de

Ilm ew e ku di nav da “heddesena<sup>19</sup>” derbas dibe ye  
Ev ne têda, yên din bi tevahî wesweseyên şeytan e

---

<sup>19</sup> Heddesena, yanê ji me ra rîwayet kirîye. (N. Sönmez)

## DÎNBÛNA DÎNBÛNÊ

Rebî bîn Silêman dibêje: “Mirovekî hat cem  
Îmamê Şafi‘î û hinek tişt jê ra gotin. Ji ber vê sedemê  
Îmamê Şafi‘î ji wî ra ev malika hanê got”:

Dînbûna te dînîti ye lê tu qet nabînî  
Dînbûna dînîtiyê şîfa dide doktorî

**DERBASKIRINA BI ÇAVNEBARAN RA**

Çavnebar ne têda, derbas dikim bi tevahîya însanan ra  
Derbaskirina bi wan ra zor e û îdarekirina wan zehmet e

Mirov çawa derbas bike bi çavnebarên nîmetan re  
Tenê tunebûna nîmetan dikare çavnebar kêfxweş bike

**ILIM DIBE HÎDAYETÊ**

Eger ilmê ciwan, dilê wî venegerîne bal hîdayetê ve  
Jîyana wî bal edaletê ve, exlaqê wî bal xweşikîyê ve

Wî kesî haydar bike ku Xwedê baştirîn dide ceza  
Ew kesên ku îbadetan dikin ji pûtan û seneman ra



**ILIM KÛR E**

Tu kesekî tevahîya ilmê nikare bi dest bixîne  
Hezar salî pê ra meşxûl be jî dîsan fayde nake

Bêguman ilim behreka ewqas kûr û bêbinî ye  
Mirov nikare tiştên herî baş hîlbijêre û bigire

## JINA PÎR

Mirovekî li ser kaxezekê van tiştên ku li jêrê derbas bûne dinivîse û ji Îmamê Şafi'î fetwayê dixwaze:

Tu yê çî bêjî: Xwedê rêya rast nîşanî te bide  
Derbarê mirovê ku ji keçeka nod salî hez dike re

Îmamê Şafi'î weha bersiva wî dide:

Em digirîn ji bo wî, bi rastî girî ji bo wî heq e  
Cihê keçên ezeb û ciwan bisekinin ji pîrê hez bike

**MINACAT**

Ey bihîzkarê diayan! Di ser zena min ra be  
Ey parêzgerê min! Li hawarîya min were

Tika dikim ji min ra karê herî baş hîlbijêrîne  
Başbûnê têxe para min û min bibexşîne

## ŞÊR Û KÛÇIK

Bêbuxzîkirin dev berdidim ji hezkirina we  
 Sedema wê piranîya di hevparên wê da ye

Eger mêşek li ser sifrê bikeve nav xwarinekê  
 Welew birçî bim jî ji sifrê dikişînim destê xwe

Lewra ne mimkun e şêrekî nêzîkî wê avê bibe  
 Eger kûçîkek berê ew dalistibe bi zimanê xwe

Eger şêrek piştî vexwarina kûçîkek wê avê vexwe  
 Hêvîya tîşteki baş nayê kirin ji şêrê di wî rengî de

Mirovê esilzade bi zikê birçî diricife û disekine  
 Lê bi hevparîya kesekî rezîl û qeşmer razî nabe

## BAJARÊ XEZZAYÊ

Yaqût el-Hemedanî dibêje: “Îmamê Ebû Ebdullah Mihemed bîn Îdrîs eş- Şafi‘î (rxl) li bajarê Xezzayê hatîye dinyayê, di zaroktîya xwe da koç kirîye û çûye Hîcazê û perwerdehîya xwe li wir qedandîye. Wî ji bo bajarê Xezzayê ev helbest hûnandîye:”

Xwedêyo! Min çiqas bîrîya axa Xezzayê kirîye  
Bi dilnexwestî dûrketime jê, ne hewceyî veşartinê ye

Xwedê bide avdan wê axê xwezila min lêda destê xwe  
Ji ber bîrîkirinê axa wî wekî kilê dikişînim çavên xwe

## FAQIH Û SEFÎH

Rewşa sefihî li gorî rewşa faqihî  
Wekî rewşa faqihî li gor sefihî ye

Li cem hinekên din, yê yek zahid e  
Ê din jî zahittir e di axaftina xwe de

Eger sefihek rojekê zêdegavîyê bike  
Mubalexe dike di nîqaşa xwe û faqih de

## QENCÎTÎ

Wexta bayê te hat bizanibe qîmeta wê  
Bêdengî ye, her tim dawîya perpitandinê

Qet xwe şûnda nede ji kirina qencîyê  
Lewra tu nizanî bêdengî kîjan demê tê

Eger guhanên hêştirê tijî şîr bûn, bidoşe wê  
Lewra tu nizanî kî dibe têjika wê hêştirê

**ELÎ NEVÎYÊN WÎ Û FATIMA**

Dema em di cemaetekê da qala Elî bikin  
Û behsa Fatimaya paqij û her du nevîyan

Ew dibêjine Rêzdarino! Ji vana dev berdin  
Lewra gotinên Rafizîyan in ewha gotin

Ji mirovan xwe dispêrim el-Muheymin  
Ew hezkirina ji Fatimayê Rafizidîtî dibînin



**PIŞTA XWE BIDE NEZANAN**

Mirovê nezan û rezîl pişta xwe bidê  
Her tişta ku dibêje vedigere li bal wê

Ma qet zirarek digihêje Çemê Feratê  
Bi ketina hinek kûçikan hundirê avê

**DOKTOR Û DERMAN**

Ma doktor bi zanîn û bi dermanên xwe  
Dikare hukmê qeza û qederê vegeîne

Çi li wî doktorî qewimîye ku ew dimire  
Berîya nexweşê ku wî derman kirîye

Hem dermankar hem jî dermankirî dimire  
Mirinê tam dike yê tîne, yê difiroşe û yê dikire

## ÇAVÊ QAYÎLBÛNÊ NABÎNE

Çavê qayîlbûnê vedişêre tevahîya kêmasîyan  
 Çavê hêrsbûnê jî derdixîne tevahîya eyban

Ewên nekin hurmetê nakim ji wan ra hurmetan  
 Ewên haya wan tunebe haya min çênabe ji wan

Ewên xwe dûr bixînin xwe dûr dixînim ji wan  
 Ewên nêzîkî min bin dibin nêzîkî hevaltîya min

Di jîyanê da em ne hewcedarê hevudin in  
 Eger bimirin jixwe nabin hewcedarê hevudin